Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1380 | 27-Gulan-2026 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ | rojnameyaronahi | @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com | Rojnameya Ronahî | +963 984 370 218

# Jina nivîskar parêzvana ziman, çand û mîrasa gelêrî ye

Ayşa Silêman/ Dêrik

**Helbestvan Ayjan Gorî diyar kir ku jina helbestvan di civaka Kurdî de parêzvana ziman, çand û mîrasa gelêrî ye û got, "Pênûsa jinê îro bûye amûreke herî xurt a berxwedana li hemberî zilmê û avakirina civakeke azad."**



Rol û bandora jinê di dîroka helbesta Kurdî de mîna çirayeke geş e ku tevî hemû astengiyên civakî û siyasî, hîmên wêjeya Kurdî bi hest û ramanên kûr dewlemend kiriye. Jinên helbestvan ne tenê behsa evîn û xwezayê kirine, lê di heman demê de bûne dengê şoreş, azadî, êş û berxwedana gelê xwe. Ayjan Gorî jî yek ji wan jinên ku karîbû bi pênûsa xwe êş û azarên gelê xwe bîne ziman, bû. Di derbarê kurtejiyan û berhemên wê de, helbestvana jin Ayjan Gorî ji Rojnameya me re axivî.

**'Ziman, asoyên vegotinê li ber min vekirin'**

Ayjan Gorî di destpêka axaftina xwe de wiha got: "Ez di 10'ê Adara sala 1991'an de li gundê Kêşikê ya girêdayî bajarê Dêrikê jidayîk bûme. Ez di nav malbatekê de mezin bûn ku bi çand û mîrasa Kurdî ve girêdayî bûn û ev yek ji bo min bû bingehek ku ez jî xwedî li kurdewariya xwe derkevim. Ji zarokatiyê ve, nîşaneyên hestê edebî di hundirê min de çêdibûn, ji ber ku meyla min ya wêjeyî di sêzdeh saliya min de dest pê kir. Bi derbasbûna demê re, min dest bi nivîsandina kurteçîrokan kir, di hivdeh saliya xwe de bi awayekî rastîn min dest bi karê xwe yê wêjeyî kir. Herwiha min hişmendiya xwe ya wêjeyî û çandî jî ji çîrokên dapîrên xwe yên ku di şevên tarî yên zivistanê de vedigotin digirt. Min di destpêkê de berhemên xwe yên wêjeyî bi zimanê erebî dinivîsand û dest bi nivîsandina helbest, gotar û çîrokan kir. Ji ber hestên min yê netewî û girêdana min bi nasnameya kurdewarî ve, êdî min xwe fêrî zimanê kurdî kir, hem xwendin hem jî nivîsandin."

**Zimanê kurdî rihekî nû afriand ji bo Ayjan Gorî**

Ayjan Gorî di berdewamiya axaftinên xwe de wiha got: "Zimanê Kurdî ji bo min bû vegera li kok, nasname û bîra kûrdewariyê, derfetek firehtir da min ku ez hest û tecrûbeyên xwe bi zimanekî xweştir bihûnînim. Min li gundê Kêşikê dibistan xwendiyê û piştî qedandina dibistanê min li Hesekê salek parêzerî xwend lê min bi dawî nekir. Di sala 2015'an de piştî vegera min ji Başûrê Kurdistanê ez tevlî qada perwerdeyê bûm û wek rêvebera dibistanê xebitîm û çend salan mamostetî jî kir. Di vê qonaxê de, min di warê çandî û zimanî de xwe li pêş xist, di zimanê Kurdî de xwe kûr kir û dest bi nivîsandina helbest û çîrokan kir. Êdî min hemû hestên di hundirê xwede, wêne û asoyên xwe kirin nivîs û ew rê û resmên civakê yên ku jinê qyed dikin min şikandin."

**Berhemên Ayjan Gorî**

Ayjan Gorî bal kişand ser berhemên xwe û wiha got: "Di 27'ê Mijdara 2025'an de yekemîn dîwana min ya helbestan a bi navê "Nevhat Elrûh" bi zimanê erebî hat çapkirin. Ew serpêhatiyek e ku ez tê de gihîştina hestyarî û dîtinek helbestî ya taybetî nîşan didim, herwiha pênc destnivîsên min yên helbestî hene ku di navbera zimanên erebî û Kurdî de ne, lê hîn belav nebûne, dîwanên min yên bi zimanê erebî evin: 'Sîcaretî, Kurdistan bi hibir elcebel û romana Elixit elkebîra'. Yên bi Kurdî nivîsandîn jî evin: 'Dara berû û Li xwe bigere'. Di heman demê de hin helbestên min ên herî navdar bi zimanê erebî hene wek helbesta; Bîranînke ku nayê jêbirin, Êşa vegerê, Bermayên evînê. Her wiha yên bi zimanê Kurdî jî evin: 'Eşqa îlahî û Destê te'. Helbestên min tenê di rûpelan de sînordar neman, lê derbasî wargehên berfireh bûne, hin berhemên min hatine veguherandin û bûne stranbêjî, wek 'Dîroka Kurd', 'Mela Mistefa Barzanî' 'Vegere', 'Windame' û 'Ez im Kurdistanim'. Her wiha ez endama Hevgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê me jî û tevlî gelek festîval, çalakî û şevbuhêrkên wêjeyî jî bûme."




Bi kamîreya Solîn Mihemed



## FERHENGA BIWÊJAN

**LI SER XWEDÎDERKETIN Û QENCIYA BI KESÊN NÊZÎK RE**

**Dest destan dişûn paşê ser û çavan dişûn:**
- Divê mirov destpêkê bi kêrî xwe were pişt re bi kêrî hin din were; heta mirov bi kêrî xwe neyê mirov nikare alîkariyê bide hinên din.

**Dest destan dişûn paşê rû dişûn:**
- Bi heman wateyê.

**Dest destan dişûn vedigerin rû dişûn:**
- Bi heman wateyê.

**Destê xwe ser serê wî ve anî:**
- Lê xwedî derket; parast; keyfa xwe jê re anî.

**Her pêxember dua ji umeta xwe re dike:**
- Her kes li kesên nêzîkî xwe xwedî derdikeve.
(Dema yek qenciyekê bi kesekî nêzîkî xwe dike hingê tê gotin)

**Ji destê wî girt:**
- Ji bo ku baştir lê xwedî derkeve jê stand.

**Lêv ji didanan pêştir in:**
- Mirov destpêkê qenciyê bi mirovê xwe yê nêzîk, bi dostê xwe yê nêzîk re dike.

**Li ser zarokên xwe rûnişt:**
- Piştî ku mêrê wê mir êdî mêr nekir; zarokên xwe xwedî kirin.

**Xwîn nabe av:**
- Kesên di xwînê de digihin hev, li hev xwedî derdikevin.

**LI SER KAR Û XEBATÊ**

**Dest bir xwe:**
- Karê xwe zû qedand; li karê xwe xweş xebitî.

**Dest hilanî:**
- Bi heman wateyê.

**Dest hilda:**
- Bi heman wateyê.

**Di destê te de çi heye:**
- Tu çi karî dikî?

**Heft kar e, dîwarê wî xwar e:**
- Bi her tiştî ve dibeze, lê karê xwe ihmal dike; ji her tiştî fêm dike, lê karê wî nîvçe ne.

**Lingekî wî li vir e yek li wir e:**
- Geh li vir dixebite geh li wir; ne li cihekî tenê dixebite.

**Ne şev lê şev e, ne roj lê roj e:**
- Ji bo kesên her dem dixebitin tê gotin.

**Pişta xwe rast nake:**
- Pir dixebite.

**Se disekine ew nasekine:**
- Pir dixebite; bi her derê ve dibeze; nasekine.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Şêrzad Yezîdî: Divê yekrêziya Kurdî di çarçoveya dirûşmeyan de nemîne



Nivîskar û siyasetmedar Şêrzad Yezîdî tekez kir ku yekrêziya gelê Kurd di vê qonaxa guhêrbar a ku Sûriyê, herêm û cîhan tê re derbas dibe, gelek girîng e, lê divê yekrêzî tenê di çarçoveya dirûşmeyan de nemîne.**R-5**

## Rêber Apo: Piçûkdîtina demokrasiyê şaştiyeke mezin e

Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk a li Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê yek ji projeyên herî girîng ên nûjen a herêmê ye, di vê çarçoveyê de Rêber Apo di 25'ê Gulanê de peyamek şand û tê de got, "Civak li hemû qadên jiyanê ji etîkê bigire heta siyaset, hiqûq û aboriyê xitimandinekê dijî. Dema me ya windakirinê tune."**R-6**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1380 | 27-Gulan-2026 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

## Aboriya Jin projeyên xwe yên xwetêrkirinê didomîne



Rêvebera Aboriya Jin li Tirbespiyê Evîn Hacî Hesen tekez kir ku demsala çandiniya îsal encamên pir baş bi xwe re aniye, herwiha ji bo xurtkirina hilberîna herêmî û pêkanîna xwetêrkirinê ew projeyên xwe yên çandiniyê didomînin.**R-8**

## Zindawerên çand û hunera Kurdî



Helbestvana Kurd Diya Ciwan ne tenê dengek helbestvanî bû, lê hebûnek jinê ya çalak di qada çandî ya Kurdî de nîşan da, wê parastina rola jinê di civak û çandê de dikir û mîrateyek edebî ya dewlemend li pey xwe hişt...**R-9**


# ROKSAN MIHEMED: DIVÊ DI WEZARETA PARASTINÊ DE HEBÛNA YPJ'Ê MISOGER BIBE

Berdevka Yekîneyên Parastina Jin YPJ'ê Roksan Mihemed diyar kir ku ew li benda kesî nemane ku mafê wan bide, ew di herêmê xwe de ne û di nav gelê xwe de tên qebûlkirin. Bi ked, têkoşîn û zanebûn xwe, ew gihiştine vê astê. Divê di nava wezareta parastinê ya Sûriyê de jî hebûna YPJ'ê misog bibe.**R-2**



## Welatiyên Sûriyê di nava pirsgirêkên ewlehî û civakî yên kûr de jiyan dikin

Piştî hatina hikumeta demkî li ser desthilatdariya Sûriyê, rewşa ewlehî, jiyanî, civakî û aborî roj bi roj xerabtir bûne. Ji bûyerên xwekuştinê bigre heta mirina bi gulbarana bêserûber û sûcên kuştina zarokan gihiştine asteke metirsîdar.**R-3**




Siyaseta Xweparastinê?!
Farûk Sakik R-4


Propogandaya reşkirinê dikare civakê ji kokê de biqedîne
Ehmed Hesen R-7


Kurd di Hevkêşeya Nû ya Sûriyê de û Lêgerîna Pêşerojeke Demokratîk-Beşa 2
Gulîstan Xalid R-10

# Roksan Mihemed: Divê di nava wezareta parastinê ya Sûriyê de hebûna YPJ'ê misoger bibe

Berdevka Yekîneyên Parastina Jin YPJ'ê Roksan Mihemed diyar kir ku ew silavên xwe ji jinên ku piştgirî dane kampanya piştgirya YPJ'ê re, dişînin û wiha got: “Em li benda kesî nemane ku mafê me bide me, em di herêmê xwe de ne û di nav gelê xwe de tên qebûlkirin, lê belê bi zanebûn, têkoşîn û keda xwe em gihiştine vê astê. Divê di nava wezareta parastinê ya Sûriyê de jî hebûna YPJ'ê misoger bibe.”

**Stêrk Mihemed/Qamişlo**

Di derbarê naskirin, guhertin û avakirina ku YPJ'ê çêkirî, îradeya ku daye avakirin, entegrasyona bi hikumeta demkî ya Sûriyê re û kampanya ku rêxistin û tevgerên jinan li Rojavayê Kurdistanê ji bo piştgiriya YPJ'ê dane destpêkirin, Berdevka Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) Roksan Mihemed bersiva pirsên Rojnameya me dan û hevpeyvîn wiha bû:



**Her kes YPJ'ê nasdike, îro careke din em dixwazin YPJ'ê nasbikin ku kengî avabû, çi guhertin çêkir û bi xwe re çi avakir?**

Salên dirêjin YPJ'ê di nava têkoşîn, guhertin, avakirin, destkeftî, zor û zehmetiyan re derbas dibe. Gelek jinên şoreşger li hember zlim, zor û bê mafiyê serîhildan e. Di dîroka gelê Kurd de jî jinên şoreşger hene mîna; Besê, Zerîfe, Leyle Qasim, Sekîne, zîlanan û heya roja damezrandina YPJ'ê herwiha her şoreşgerek ji derveyî yên ku me binavkirine mîrasek ji me re hiştin, mîrasa ku her tişt ji bo mafê jinê, tu carî serî netewandin, teslîmiyet qebûlnekirin û li pey doza xwe ketin û ev jî mîrasekî gelek girîng bû ji bo me ku em ê jî li ser van tecrûbeyên ku derbas bûne zor, zehmetî û astengirên ku nehiştiye jin bighêje mafê xwe çi ne em tecrûbeyan jê digirin. Li Rojavayê Kurdistanê salên dirêj ji têkoşîna siyasî û civakî û bi taybet weke jin. Gavavêtin ango çirûska yekemîn a Şoreşa 19'ê Tîrmehê hîn bêtir rola jin, berpirsyarî li hember gel, civak, dîroka xwe û bêmafiyê ku li hember jinê pêktên û çawa ku karibin mafê xwe û gelê xwe bi dest bixwe û li pey azadiya xwe bikeve, derket pêş. Jinan xwe û saziyên xwe rêxistin kirin û ava kirin. Her saziyek di salên Şoreşê de hatin avakirin bi pêşengtî û rola jinê bû. Jinan di warê rêxistinî, civakî, ziman, çand û di her qadeke jiyanê de xwe birêxistinkirin e piştî êş û bê mafiyên mezin di derheqê jinê de çêbûye, jinê di jiyana xwe de girîngiya xweparastinê û xwe rêxistinbûnê sereke dît. Divê ku em xwe rêxistin bikin, îradeya me yek be û hêza me ya xweparastinê hebe, da ku em di vê sedsalê bighêjin maf û azadiya xwe. Yek ji encamên vê şoreşê kar û xebatên jinan bi salan kiriye Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) bû. Her çiqas di kêliyên destpêkê ya avabûna YPJ'ê hejmar kêm bû, lê belê her cihê ku YPJ'ê lê amade bû rola wê hebû û dikarîbû ku pêşengtiyê bike. Di 4'ê Nîsanê de bi konfransa ku çêbûye, êdî sazûmaniya YPJ'ê û sazûmaniya hêza leşkerî, alê YPJ'ê, pîvan, silogan û endamtiya wê bi çi rengî be, hate amadekirin. Her tiştî bi aliyekî rêxistinê dest pê kir ji bo vê jî em dibêjin ji 2011-2013 helbet pêvejoyeke gelekî girîng bû, cara yekemîne li herêmên me ev tişt çêdibe ku jin çek radike û tevlî qadê parastinê dibe. Zor û zehmetî van salan helbet hebû, lê piştî ku mebesta xweparastinê hate fêmkirin, tevlîbûn di refên YPJ'ê de zêde bû.

**Pêvejo û şerên ku YPJ'ê têre derbasbûye çi ne, herwiha îradeya ku ji bo hemû jinan da avakirin di çi astê de ye û belavbûna girîngiya xweparastinê di nava jinan de bi çi awayî ye?**

Di 2013-2014'an û şûnde ji bo YPJ'ê pêvajoyeke cûda bû di Kobanê de hîn bêhtir YPJ'ê pêşengtiya xwe derxist, di dîroka YPJ'ê de şerê Kobanê pêvejo û mîraseke gelek girîng bû. Di Kobanê de YPJ'ê li hember zihniyata mêr û çeteyên DAIŞ'ê şer kir, ne tenê mebesta wan bû ku ax, çand an welatekî dagirbikin, lê belê xwastin di Rojava de temsîliyeta pêşenga vê şoreşê ku jin bû, wê teslîm bikin û êriş li ser hebûna jin bikin. Berpirsyartî, rol, pêşengtî û ew cesaret, xwe bawerbûna endam û fermandarên YPJ'ê ku pêşengtî di şerê li dijî DAIŞ'ê de kirine di Kobanê de derket pêş. Bi pêşengtiya Arîn Mêrkan, Rêvan, Zehra, Destînan û gelek hevalên me ku di Kobanê de gihaştin asta Şehadetê di wir de YPJ'ê karîbû dengê xwe û dengê tevahî jinan li herêma Rojava bighînin cîhanê. Ji ber ku YPJ'ê ne tenê hêzeke leşkerî ye, lê belê naveroka wê gelek cûda û dagirtî ye. Ji ber ji destpêkê de mebesta me ew bû ku em kesayet avabikin, di YPJ'ê de kesayeta jin hata avakirin. Jina ku dîrok xwe nasnekiriye, îradeya wê tune bûye, jina ku bi kevneşopiyan ve hatibû sînordarkerin ango zagonê ku di derheqê wê de dihat standin, li hemberî wê YPJ'ê ji bo wan xwebawerbûyîn, avakirina xwesertiyê di milê zanistî û zanbûna de ku cihê lêbe diyar be û şopê xwe bihêle di nava YPJ'ê de avakirina jin û mirovbûnê esas bû. Ji ber ku tu kesayet ava nekî, tu nikarî şer bikî û danasîna parastinê jê fêm bikî, ji ber sîstemê hertişt ji dest jinê birî bi vê yekê re me xwe û dîroka xwe naskir ku em ê çawa parastina xwe bikin. Li ser vê esasê me dest bi têkoşîna xweparastinê kir. Divê makanîzmeya xweparastinê di her alî de hebe eger di leşkerî de tune be divê di mejî, giyan û hestan de hebe. Aliyên xweparstinê gelek in rojnemevan bi kemîreya xwe diparêze, nivîskar bi pênûsa xwe û bijîşk bi zanebûna xwe parastina vê civakê dike, di her beşeke civakê de aliyê wê ya parastinê heye bi giştî jî weke laşkerî eger aliyê wê ya xwepatrastinê tune be ew hebûn ne di nava ewlehiyê de ye. Ji ber ku bi salane êriş û siyaseta qirkirinê bi taybet li hember jin heya roja me ya îro tê meşandin, ji ber sîstema jinê di warê rêxistinî, civakî û leşkerî de tune bû.

YPJ'ê her tişt di nava xwe de hewand, felsefe û çandek bi xwe re afirand. Her çiqas pêvajoya YPJ'ê têre derbas bûne zehmetî û xetayî hebûn li kêlek wê, gelek destkeftî jî bidestxistin. YPJ'ê di qada parastinê de li herêm û cîhanê, gava yekem bû. Ji ber heta niha tu rêxistinbûneke leşkerî a jinan derveyî YPJ'ê nîn e. Ew danasîna di sîstema heyî de jin di hindek qadan de bimîne ev nasîn serwere. Di fikir û felsefeya me de jin dikare di her warî de cih bigire. Di heman demê de ew cihê ku jin lê hebe hîn daha zêdetir pêşketin lê heye. Di qada leşkerî de careke dîtir weke jin li Rojavayê Kurdistanê bi pêşengtiya jina Kurd piştre tevlîbûna jinên ereb, Asûr, Tirkmen, Sûryan û anternasyonal e. Di vir de hişmendiyek hate avakirin eger ez ê hebûna xwe biparêzim pêwîst e hêzeke min a leşkerî hebe. Parastin jî mafeke rawa ye, li ser wê esasê di hemû pêvejoyên ku em tê re derbas bûne, ji pêşengtiya ku YPJ'ê kiriye, şihadeta ku çêbûne, fermandartiya şer û heyanî gaziyên şer; ev hemû mîrasên YPJ'ê ne.

Dema em behsa hebûn û mafê jinan dikin em ne tenê behsa jinên li Rojava dikin, lê belê em behsa tevajî jinan dikin ji ber ku doza jin dozeke giştî ye. Her çiqas sîstem dixwaze wê parçe û lawaz bikin lê em dizanin ku hebûna jin hebûn û dozeke azadiyê ya giştî ye. Bi vê mebestê me şer dimeşandin, perwerdeyên ku me dîtine û akademiyên ku li gel me him di warê fikrî û leşkerî de hemû li ser esasê em van pîvanên jiyanê û civakê nasbikin, biparêzin û mezin bikin. Em di her pêvajoyê de bi gelê xwe re bûn, ji bo me weke YPJ'ê piştgiriya gelê me hêza herî esas e û têkoşîna jinan yê ku bê navber didom e, ev dihêlê di warê xweparastinê de me hîn bêhtir di hurgulî û zanistiyên xweparastinê de, xwe kûrtir bikin ku em karibin van destkeftiyan biparêzin û misoger bikin.

**Giringiya misogerkirima mafê jinan bi tayber YPJ'ê di nava artêşa Sûriyê û destûr de çi ye?**

Maf nayê dayîn, lê belê tê standin bi taybet ji bo jinan, têkoşîna me li ser vê esasî ye. Me sedeqeyek ji kesî nexwast, em dawaxa mafê xwe bi têkoşîn û berdêlên ku me da ye, dikin. Em li benda kesî neman ku mafê me bide me, lê belê bi zanebûn, têkoşîn û kedê xwe em gihîştin vê astê. Pêwîstî nîne ku kes were me biparêze anjî nêrîn û biryar di derbarê me de bidin. Ji ber ku em êdî gihaştine wê astê ku em bibin xwedî îrade. Êrişa li ser hebûna jin tê wateya ku êdî em nêzî azadiya xwe dibin. Her çiqas zehmet be jî em nêzî misogeriya mafê xwe dibin.

Niha di ortê de mijara entagrasyonê heye, helbet YPJ'ê jî hêzeke esasî ye di vê herêmê de. Têkoşîna 14 salan ne hêsane em bi têkoşîn û xwîdana jinan gihaştine vê astê. Mafê jinan mafekî rawa ye, kes nikare derveyî vê bêje. Di nava wezareta parastina Sûriyê de anjî destûrî de dive mafê jinê were parastin û cihê xwe bigire. Em di herêmê xwe de ne û berê jî em di herêmê xwe de bûn. Di nav gelê xwe de em tên qebûlkirin, divê bi awayekî zagonî di artêşê de jî YPJ'ê ango jin werin qebûlkirin. Qabûlkirina YPJ'ê qebûlkirina tebahî jinan e. tekoşîneke mezin li pêşiya me heye, ji ber zihniyata ku jinê qebûlnake li beramberî me heye.

**Di 26'ê Nîsana 2026'an de paltforma çalakiyên hevbeş a tevger û rêxistinên jinan li Rojava ji bo piştgitriya YPJ'ê herwiha beşdariya YPJ'ê di nava wezarata parastinê ya Sûriyê de kampanyeke dan destpêkirin, ev kampanya bi awayekî bi lez belav bû, herwiha gelek jinan li Kurdistanê û Rojhilata Navîn nameyên piştgiriyê ji bo YPJ'ê şandin, hûn vê piştgiriyê çawa dibînin, herwiha ew kesên ku piştgiriya we kirine nameyên we ji bo wan çi ye?**

Di pêvajoya ku em niha tê re derbas dibin bi taybet di warê jin de ji bo rol û misyona jin û misogeriya mafê jin di destûra Sûriyê ya nû de ji aliyê rêxistin û saziyên jin ên Rojavayê Kurdistanê ve kampanya pitgiriya hêza xwe YPJ' hate dest pê kirin. Ev kampanya çawa ku di 26'ê nîsanê de dest pê kir bi wê re gelek têkilyên mezin hatin raberkirin. Di vê çarçoveyê de gelek name ji jinên Misirî, Yemen, Libnan, Cezaêr, welatên Amerîka Latînî, Abilyaya, Berazîl, Ercentîn û Kudistanê gelek name û dîmenên piştgiriyê û rêzeçalakî, kom xebat, panel û hwd hatin derxisitin. Ev çalakî me bi hêztir dike ku em têkoşîna xwe bidomînin ku çawa me dengê xwe gihandiye tevahî jinan divê êdî em vê dengî di warê zagonî de misoger bikin. Bi vê mebestê em slav, rêzdayîn û hezkirina xwe ji hemû piştgirên wê kampanyê re dişînin. Di nava hevkariya me ya fikir de sînor nînin, sînor nikarin girêdanê me ji hev qut bike. Sîstem çiqas hewil dide bi êrişên xwe jinan biberçoqîne, hebûn û destkeftiyên jinan ji holê rabike, lê bi vê kampanyê re careke dîtir derdikeve pêş ku jin êdî tema azadiyê dikin ku gihaştiye wê zanebûnê ku tu siyaset nikare îradeya wê bişkîne û mafê wê ji dest bigire. Her çiqas rê zehmet be lê zehmetî bi serkeftinê re misoger û domdar dibe. Em ê bi hevre bibib dengê tevahî jinan û bibin bersiva jinên şoreşger û tekoşer yên ku di dîrokê de ked dane emê keda wan misoger bikin .



# Nakokiyên herî navdar li ser şûnwaran û berhemên dîrokî

Mijara vegerandina Şûnwarên çandî ji bo welatên wan ên resen di rêza yekem a pirsgirêkên heyî yên muzexaneyên mezin ên cîhanê de ye.


**Navenda Nûçeyan**

Rastiyên yasayî nîşan didin ku vegerandina xezîneyên arkeolojîk ku bi awayên qaçaxî û neqanûnî hatine kirin, pêvajoyeke hêsantir xuya dike, bi taybet dema ku delîlên berbiçav ên dizî an binpêkirina peymanên navneteweyî hebin. Ev yek di dawiya Nîsanê de dema ku Dewletên Yekbûyî ragihand ku zêdetirî 330 xezîneyên arkolojîk yên dizî ji bo Îtalyayê û zêdetirî 650 ji bo Hindistanê vegerandine, hate nîşandan. Berevajî vê, dema ku berhemên ku bi rêya peymanên ku di dema îmzekirina wan de “qanûnî” dihatin hesibandin hatine bidestxistin, pêvajo pir aloz dibe. Ev pir caran dibe sedema nakokiyên yasayî û dîplomatîk û dibe ku bi dehê salan an jî heta bi sedsalan bidomin, wekî ku di sê dozên navneteweyî yên girîng de tê nîşandan.



**Misir li dijî Almanya (Peykera Nefertîtî)**

Peykerê ji kevirê cêrî yê boyaxkirî an jî (Kevirê kilsê) yê Şahbanû Nefertîtî, hevjîna Fîrewn Axnatûn, vedigere dordora sala 1340'î berî zayînê. Di sala 1912'an de, arkeologê Alman Ludwig



Burchardt di dema kolandinên li Til El-Amarna (nêzîkî 300 kîlometre dûrî Qahîreyê), cihê kavilên bajarê kevnar ê Misirê Axîtatûn, ev şûnwara hêja keşf kir.

Xebatên arkeolojîk di bin çavdêriya “Komeleya Rojhilatî ya Alman” û bi destûra kolandinê ya fermî hate kirin. Li gorî rêziknameyên wê demê, hemû keşf diviyabû bi awayekî wekhev di navbera Misir û Almanya de û di bin çavdêriya Xizmeta Antîkên Misrê de bihata parvekirin, ku karê wê ew bû ku pêşî li derketina berhemên herî hêja ji welêt bigire.

Tê texmînkirin ku Burckhardt bi zanebûn berpirsê Misrê yê berpirsiyarê pêvajoya dabeşkirinê şaş kiriye û girîngiya peykerê Nefertîtî di tomarên parvekirinê de kêm kiriye. Arkeologê Alman Ludwig Burchardt wêneyek ku peyker bi awayekî asayî û ne balkêş nîşan dide, pêşkêş kir û di raporê de destnîşan kir ku ew ji Cebsînê hatiye çêkirin, ne ji kevirê Cêrî yê hêja. Li ser vê bingehê peyker di nav para ku ji aliyê Alman re hatiye dayîn de cih girt. Di destpêkê de peyker hat veguhestin bo James Simonê yê Alman, ku ew fînanse û sponsoriya şandeya arkeolojîk dikir. Heta sala 1920'an li mala xwe hiştibû, paşê biryar da ku hemû berhevoka xwe ya berhemên dîrokî yên li Til El-Amarna hatine derxistin, bide muzexaneyên Berlînê. Di sala 1924'an de, peykerê Nefertîtî cara yekem li Berlînê bi eşkereyî hate pêşandan. Di encamê de Misrê daxwaza vegerandina wê ya tavilê kir, bi îdiaya ku xapandinek bûye sedema derxistina vê peykerê, ku nikare wekî vedîtineke asayî were nirxandin.

James Simonê hewl da ku krîzê bi pêşniyara danûstandineke çandî di navbera her du welatan de çareser bike. James Simon nameyek fermî ji Wezîrê Çandê yê Prusyayê re şand, ji ber ku muzexaneyên Berlînê ji hêla qanûnî ve di bin desthilata Prusyaya Azad de bû û daxwaza vegerandina peykerê bo Misrê kir. Lêbelê, hewldanên wî bi tevahî hatin paşguhkirin. Di sala 1933'an de, hikûmeta Prusyayê li ser vegerandina peykerê erê kir ku peykera şûnwarî radestî Qiral Fuadê yekem ê Misrê bike, lê Adolf Hitler, ku wê demê serokwezîr bû, mudaxele kir û peyman asteng kir. Peyker di sedsala 20'an de li gelek muzexaneyên cuda yên Almanya hate bicihkirin û di dawiyê de di sala 2009'an de li Muzexaneya Neues a Berlînê bi awayekî daîmî hate nîşandan.

Di sala 2011'an de, hewldanên yasayî ji nû ve dest pê kirin, dema ku arkeolog û Sekreterê Giştî yê berê yê Encumena Bilind a Arkolojîk, Dr. Zahî Hawas, serkêşiya hewldanên mezin ji bo vegerandina peykerê kir. Lêbelê, ji ber bûyerên şoreşa Misrê, danûstandin rawestiyan. Di sala 2024'an de, Hawas daxwaznameyeke navneteweyî ya berfireh da destpêkirin û daxwaza vegerandina peykerê kir, lê aliyê Almanî di redkirina xwe de israr kir û niyeta xwe nîşan nedaye ku peykera dîrokî vegerîne.

**Yewnanistan li dijî Brîtanyaya Mezin (Ruxamê Parthenonê)**

Parthenon yek ji şûnwarên herî berbiçav ên mîmariya Yewnana Kevnar e, ew perestgehek kevnar e ku ji dema avakirina wê di sedsala 5'an a berî zayînê de li ser Akropolîsa Atînayê sekinî ye. Bi derbasbûna demê re, ji ber şer û dabeşbûnên herêmî gelek guhertin lê bû, carinan wekî dêreke Xiristiyan û carinan jî wekî mizgeft xizmet kir. Di sala 1687'an de, di şerê mezin ê Osmanî de, di perestgehê de teqîneke mezin çêbû dema ku ew wekî depoyek barûdê dihat bikar anîn, di encamê de beşek mezin ji ban û dîwarên wê herwiha gelek hêmanên wê yên xemilandî hilweşiyan. Xirabûna Parthenon piştî wê berdewam kir.

Di destpêka sedsala 19'an de, dema desthilatdariya Osmanî li ser Yewnanistanê ku nêzîkî çar sedsalan berdewam kir, kavilên Parthenonê bala Thomas Bruce balyozê Brîtanî li Qestentîniya û berhevkarê kevnar ku bi navê Lord Elgin tê nasîn, kişand. Lord Elgin pisporekî hunerî ye, xwesteka xwe ya parastina vê mîrateya kevnar anî ziman û ji Siltanê Osmanî Selîm ê sêyemîn destûra fermî wergirt da ku Parthenonê lêkolîn bike herwiha jê qaliban çêbike û beşên girîng derxe. Li gorî vê yekê, di navbera salên 1801 û 1812'an de, Lord Elgin hêmanên xemilandî (beşên pêşên ê avahiyê), perçeyên peykeran û hêmanên din ên mîmarî ji Atînayê şand Brîtanya Mezin. Ev barkirin ji nêzîkî 200 sanduqên berhemên dîrokî pêk dihatin, ku bi qasî nîvê xemilandina peykersaziyê ya mayî temsîl dikirin.

Kiryarên Elgin li Brîtaniya reaksiyonên cuda derxistin holê û helbestvanê navdar George Gordon Byron di nav wan kesên ku wî bi hovîtiyê û wêrankirina antîkan tawanbar kir. Dîplomat hêvî dikir ku peykerên Parthenonê di berhevoka xwe ya taybet de bihêle, lê ji ber deynên zêde li ser wî, ew neçar kir ku wan bifroşe. Parlamentoya Brîtanî di sala 1816'an de ev berhevok bi 35 hezar Cinêh Îsterlînî £ (wek nîvê lêçûnên wî yên kesayetî yên di rêwîtiya wî de) kirî, şûnwar paşê ji Muzexaneya Brîtanî ya li Londonê re hatin veguheztin û heta roja îro jî li wir têne pêşandan.


Yewnanistanê di sala 1830'an de serxwebûna xwe bi dest xist û ji wê demê ve dest bi hewldanek fermî kiriye da ku şûnwarên xwe yên kevnar vegerîne. Ev nakokiya dîplomatîk di salên 1980'an de bi saya hewldanên bêwestan ên Wezîra Çandê ya Yewnanistanê Melina Mercouri gurtir bû. Di deh salên dawî de, Atînayê gelek caran gavên dîplomatîk avêtine, daxwazname pêşkêş kirine, serî li UNESCO'yê dane û danûstandinên asta bilind li dar xistine. Wekî encama van hewldanan, Muzexaneya nû ya Akropolîsê li Atînayê di sala 2009'an de hate vekirin, ku bi taybetmendiyên mîmarî yên taybetî hat çêkirin da ku vegera şûnwarên “Londonê” bicîh bîne û wan li welatê resen nîşan bide.

Yasayek Brîtanî ya sala 1963'an çareserkirina vê pirsgirêkê aloztir dike, ku bi qanûnî Muzexaneya Brîtanî dev ji berdan an vegerandina berhevkirinên xwe qedexe dike. Di salên dawî de, nûnerên her du welatan li ser îhtîmala deyndana demdirêj ji bo şûnwarên dîrokî nîqaş kirin, lê hîn jî tu rêkeftinek çênebûye. Di Kanûna 2025'an de, serokê desteya bawermendan a Muzexaneya Brîtanî û serokwezîrê berê yê darayî yê Brîtanî George Osborne, nakokiya Parthenonê wekî dijwartirîn pirsgirêka ku Muzexaneya Brîtanî di 200 salan de pê re rû bi rû maye bi nav kir.

**Îtalya li dijî Fransa (Mona Lisa)**

Teoriya herî berfireh a pejirandî, ku ji hêla Muzexaneya Louvre ve tê piştgirî kirin, îşaret dike ku Mona Lisa, Lisa Gherardini, hevjîna bazirganê hevrîşimê yê Florensî Francesco del Giocondo e. Hunermendê jîr Leonardo Davinci derdora sala 1503'an li Floransayê dest bi xebata li ser vê tabloya navdar kir û di nav çend salan de qonax bi qonax temam kir.

Di sala 1516'an de, li ser vexwendina fermî ya Qiral Francisê yekem yê Fransayê, da Vinci ji Floransayê çû Qsera “Clos Lucé” ya nêzîkî Amboise da ku lê jiyan bike di heman demê de tablo bi xwe re bir. Li gorî Muzexaneya Louvre, Qiral Francisê yekem Mona Lisa di sala 1518'an de kirî, lê Ansîklopediya Britanî destnîşan dike ku kirîn di sala 1519'an de, piştî mirina da Vinci, pêk hatiye. Ji ber vê yekê, ji sala 1519'an tablo bû beşek girîng a berhevokên qraliyeta Fransayê û piştî Şoreşa Fransî (1789-1799), ew bi awayekî daîmî li Muzexaneya Louvre hate bicihkirin.



Ji aliyê qanûnî ve, mafê fermî yê Îtalyayê tune ku vê tabloyê vegerîne û helwesteke fermî ya hikûmetê jî tune ku xwedîtiyê îdîa bike. Digel vê yekê, ji sed salan zêdetir e, çalakvanên Îtalî hêviya xwe didomînin ku Mona Lisa vegerînin welatê wê ya dîrokî.

Yekem hewldana diziyê ya belgekirî di sala 1911'an de ji hêla Vincenzo Perugia, karmendekî Îtalî yê Muzexaneya Louvre ve pêk hat. Tabloyê ji dîwêr derxist û di bin cilên xwe de veşart û reviya. Paşê wî îdia kir ku wî tablo ji ber sedemên welatparêzî dizî ye, ji ber ku dibîne ku Frensiyan di dema Şerên Napolyonî de, bi neqanûnî desteser kiriye. Lêpirsîna polîsan du salan bi temamî berdewam kir, di wê heyamê de di hundurê mala Perugia de veşartî ma.

Di sala 1913'an de, Perugia hewl da ku tabloyê bifiroşe xwediyê pêşengeheke hunerî li Floransayê, xwediyê pêşengehê tavilê ew gilî li polîsan kir. Ev yek bû sedema girtina Perugia û vegera Mona Lisa ji bo Louvre. Ev bûyer, sedema sereke ya navdariya navneteweyî ya berfireh a tabloyê ye heta îro, ji ber şopandina medyaya ya berfireh li ser darizandinê.

Di sala 2012'an de, Komîsyona Neteweyî ya Mîrata Dîrokî û Çandî ya Îtalyayê, bi hevkariya bajarê Floransayê, kampaniyek ji bo vegerandina demkî ya tabloyê da destpêkirin. Komîsyonê bi fermî daxwaza hevdîtinê bi Wezîra Çandê ya wê demê ya Fransayê, Aurélie Filippetti re kir, lê daxwaz hat redkirin. Di sala 2014'an de, lîstikvanê navdar ê Amerîkî George Clooney mudaxeleyî krîzê kir û behsa pêwîstiya vegerandina tabloyê bo Îtalyayê kir.

Di navendên hiqûqî yên dawî de, dadgeha îdarî ya herî bilind a Fransayê dozek di sala 2024'an de ku ji hêla rêxistina “International Restitutions” ve hatibû vekirin, red kir, ku îdia dikir ku ew mîrateya Leonardo da Vinci temsîl dike û daxwaz kir ku Mona Lisa ji Louvre were rakirin. Di sala 2025'an de, Francesca Caruso, şêwirmenda çandî ya herêmî ya Lombardy, pêşniyar kir ku tablo bi demkî li Mîlano, Îtalyayê were pêşandan, heta xebatên sererastkirinê li muzexaneya Louvreyê bi dawî bibe. Li gorî rapora ku ji malpera RT hatiye wergirtin.

# Qanûn rê ye û dema libendêmayînê nema ye

**Cemîl Xoce**

Şandeya DEM-PARTÎ'yê di 24'ê Gulana 2026'ê bi Rêber Ocalan re civiya. Weke her carê Rêber Ocalan rêzenêrîn û helwestên diyar û girîng pêşkêş kir. Rêber Ocalan bi çavdêriyeke têgihaştî rewşê dişopîne. Di hemwextî rewşa ku Tirkiye û herêm tê re derbas dibe, dîtin û ramanên wî weke perspektîf derdikevin holê. Rêber Ocalan di peyama xwe ya dawî de tekezî li xalekê dike ku "Dem li benda kesî namîne".

Rêber Ocalan dema ku dibêje: "Çarçoveya yasayî dikare bingehê pêvajoyê deyne" cihek ji bo nezelaliyê nehişt. Ev hevoka kurt girîngiyeke kûr dihewîne. Ew ne behsa şoreş an pevçûnê dike, lê behsa reforma yasayî ya birêkûpêk dike. Ew banga sererastkirina qanûnan dike wekî yekane deriyê çareseriya rastîn a pirsgirêka Kurd li Tirkiyeyê. Ev helwest di eslê xwe de ne nû ye, lê îro lezgîntir e. Rêber Ocalan bawer dike ku sererastkirina qanûnan ne tenê prosedureke teknîkî ye, lê belê "bingehê avakirineke rastî û pozîtîv a demokrasiyê ye". Bi gotineke din, demokrasî bi gotinan nayê ragihandin, lê bi rêya qanûndanînê tê avakirin.

Tiştê ku di axaftina Rêber Ocalan de balkêş bû, daxaza avêtina gavên bilez bû. Ew bi eşkereyî dibêje: "Mayîna di rewşa libendêbûnê de, tenê xeteriyan diafirîne. Dema me tuneye ku em winda bikin." Ev gotin nîşan didin ku ew bawer dike ku pencereya derfetê niha vekirî ye, lê dibe ku kêliyek were ku bê girtin jî. Çima ev lezgînî? Ji ber ku herêm dikele. Ew bi fikareke kûr li ser zêdebûna aloziyên li Rojhilata Navîn dinihêre, dibîne ku welatên mîna Îsraîl û Îranê ber bi tundrewî û radîkalîzmeke mezintir ve diçin. Di atmosfereke wisa de, neteweperestiyên teng zêde dibin, dabeşbûnên di navbera gelan de kûrtir dibin, û bêtir xwîn tê rijandin. Ji ber vê yekê, pêşvebirina pêvajoya aştiyê niha ne luks e, lê pêdivî ye.

Yek ji xalên herî bibandor ên nirxandinên wî, şîroveyên wî yên li ser serdegirtina polîsên Tirk a li ser navenda Partiya Gel a Komarî (CHP) bû, ku wan derî bi çekûç şikand. Wî bi awayekî retorîkî pirsî, "Gelo ketina bi zorê ya navenda giştî ya partiyeke siyasî, bi şikandina deriyê wê ya bi balyozê, li gorî rêbazên demokrasiyê ne?". Ev pirs ji bûyerê bi xwe derbas dibe. Ew li vir nexweşiyeke avahîsaziyê di nav pergala Tirkiyeyê de teşhîs dike û dibêje ku nebûna demokrasiya rastîn sedema bingehîn a hemû krîzan e, tevî pirsgirêka Kurd bi xwe. Di vê çarçoveyê de, ew gotineke balkêş dibêje: " Ti rewşeke ku bi qasî pêşxistina pênaseya demokratîk a komarê lezgîn be, nîn e."

Rêber Ocalan tekez dike ku tiştê ku ew dixwaze ne cudakirin û ne jî şer e, lê belê "entegrekirina Kurdan di komareke demokratîk de ye." Ew pêvajoya aştiyê wekî ji nû ve birêxistinkirin û modernîzekirina têkiliyên Tirk-Kurd, ku bi dehan salan ji birînên kombûyî xera bûne, bi nav dike. Ew bawer dike ku pirsgirêka Kurd li herêmê bûye çavkaniya tundûtûjiyê û çareserkirina wê bi awayekî sîstematîk tê wateya zuwakirina vê çavkaniyê. Ev ne teoriyeke îdealîst e, lê nirxandineke rastîn e: her ku pêvajoya aştiyê pêşve biçe, ew qas gurkirina nakokiyê dê kêmtir bibe.

Banga Rêber Ocalan ne tenê bi Kurd an Tirkan ve sînordar e. Ew bang li "her kesî" dike ku piştgiriyê bidin rêya aştî û civaka demokratîk. Ew heta destnîşan dike ku rewşenbîr û akademîsyenên navneteweyî ev rê pejirandine û peyamên wan di pirtûkekê de hatine berhevkirin, ku aliyekî navneteweyî yê vê mijarê nîşan dide.

Bi kurtasî, tiştê ku em ji peyamên Rêber Ocalan fêr bibin, ew e ku dem guncaw e û tenê windakirina ku nayê efûkirin, dem windakirin e. Ew gotara xwe li ser sêgoşeyeke zelal ava dike: Qanûn amûr e, demokrasî armanc e û aştî pêdivî ye, ne vebijarkek e. Li vir çend pirs derdikevin holê: Gelo Tirkiye dê bersiv bide? Gelo Parlamento dê bi hesasiyeta dîrokî ya ku ew dixwaze tevbigere? Ev pirs divê ji aliyê desthilatdariya li Enqereyê werin bersivandin. Peyam hatiye wergirtin û dem derbas dibe.


Gulîstan Xalid

## Kurd di Hevkêşeya Nû ya Sûriyê de û Lêgerîna Pêşerojeke Demokratîk- Beşa 2

Entegrasyona demokratîk ne ew e ku mirovek ji nasnameya xwe dûr bikeve da ku tevlî pergalê bibe. Berevajî vê, ew e ku gelên cûda bikaribin bi nasname, ziman, çand û îradeya xwe ya siyasî jiyanek hevpar ava bikin. Yekîtî ne bi rêya homojenkirinê, lê bi rêya pirrengiyê pêk tê. Ev yek ji pirsgirêkên bingehîn e ku Kurd bi salan e tînin ziman: "Em beşek ji vî welatî ne, lê em dixwazin bi wekhevî û azadî bijîn, ne bi înkarkirina nasnameya me."

Di bingehê têgihîştina entegrasyona demokratîk de ev feraset heye: Xurtkirina rêveberiyên herêmî, xwerêveberina gel ya xwe bi xwe, garantiyên destûrî ji bo mafên çandî û siyasî, beşdariya jin û beşên civakî di rêveberiyê de, Modelek ewlehiyê ku ne tenê dewlet-navendî be, lê di heman demê de jî civak-navendî be. Ev model ne tenê ji bo Kurdan, di heman demê de ji bo Ereb, Suryanî, Durzî û hemî civakên ku li Sûriyeyê dijîn jî dikare bibe çareseriyek domdar.

Avahiya ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê derketiye holê ne tenê formasyoneke leşkerî ye. Her wiha ezmûneke civakî ya cuda afirandiye, ku her tiştî, ji rêxistinên jinan û encumenên herêmî bigire heya pirzimanî û rêveberiya hevbeş, vedihewîne. Nêzîkatiyeke ku vê ezmûnê bi tevahî paşguh dike, li şûna ku çareseriyan peyda bike, dibe ku dabeşbûnên nû biafirîne.

Îro, pirsgirêka Kurd ne tenê "dosyayek ewlehiyê" ye. Ew rasterast bi pirsgirêka demokratîkbûnê li Rojhilata Navîn ve girêdayî ye. Hebûna bi mîlyonan Kurdên ku li Tirkiye, Îran, Iraq û Sûriyeyê dijîn êdî nayê înkarkirin; divê ew ji perspektîfa çareseriyên demokratîk ve were çareserkirin. Ji ber vê yekê, şêweya têkiliya ku bi Kurdên li Sûriyeyê re tê danîn ne tenê mijarek navxweyî ye, lê di heman demê de dê rêgezek stratejîk jî diyar bike ku dikare bandorê li pêşeroja tevahiya herêmê bike. Ger hikûmeta nû bi rastî pêşerojek demokratîk armanc dike, divê ew Kurdan ne tenê wekî hêmanek ku di pergalê de were entegrekirin, lê wekî yek ji hevkarên damezrîner ên Sûriyeya nû bibîne.

Îro, pirsgirêka herî mezin ne sînor in, lê meseleya zîhniyetê ye. Ji ber ku têgeha klasîk a dewleta neteweyî bi salan e li Rojhilata Navîn krîzan çêdike. Fikra yek ziman, yek nasname û yek navendek pevçûnên domdar diafirîne ji ber ku ew cihêrengiya civakî tepeser dike. Sûriye niha bi du rêyan re rû bi rû ye: Yan ew ê hewl bide ku modela dewleta kevn bi sloganên nû ji nû ve ava bike, an jî ew ê modelek jiyana demokratîk li ser bingeha îradeya hevpar a gelê xwe pêş bixe. Entegrasyona rastîn tenê bi rêya duyemîn mimkun e. Wekî din, pêvajoyên ku di bin navê "entegrasyonê" de têne kirin dê ji hêla beşên girîng ên civakê ve ne wekî çareseriyek, lê wekî pêvajoyek nû ya jiholêrakirinê werin dîtin.

Tiştê ku îro Sûrîyeyê hewce dike ne tenê bidawîanîna şer e. şer bi avakirina edaletê bi dawî dibe. Çareseriya mayînde avakirina sîstemeke ku mirov bikaribin di ewlehiyê de bijîn, ne di tirsê de; di wekheviyê de, ne di înkarê de; û di hevkariya demokratîk de, ne di bin zexta navendî de. Ji ber vê sedemê, entegrasyona demokratîk ne tenê hilbijartinek siyasî ye, lê ji bo pêşeroja Sûrîyeyê pêdiviyek dîrokî ye.

# Di nava şewata Rojhilata Navîn de rêya Kurdan û heqîqeta xweavakirin

**Hasan Ağaç**

Rojhilata Navîn careke din di nav guherînek dîrokî ya mezin re derbas dibe. Şerên navbera dewletan niha ne tenê sînoran, lê di heman demê de hevsengiyên herêmî, pergalên hevpeymanan û pêşeroja gelan jî ji nû ve diafirînin. Di demên weha de, xetera herî mezin entegrekirina gelên piçûk di hesabên hêzên mezin de ye. Ji ber ku di şerên hêzên mezin de, gel pir caran ne mijar in, lê bêtir çîpên danûstandinê ne. Ji bo Kurdan, ev tam cihê pirsgirêkê ye. Ji ber ku gelê Kurd êdî divê ne tenê hêzek be ku "beşdarî" lîstikek ji hêla yên din ve hatî danîn be; divê ew veguherin îradeyek dîrokî ku dixwaze rêya xwe biafirîne. Mercê yekem ji bo vê yekê ew e ku meriv bibe gelekî ku ava dike, ne yekî ku li bendê ye. Civakên ku li bendê ne di dawiyê de di planên yên din de têne bicîh kirin. Civakên ku rêya xwe bi xwe diafirînin pêşeroja xwe, siyaset û rêça xwe ya dîrokî diyar dikin. Îro, pirsgirêka bingehîn ji bo Kurdan ne ew e ku li ber destê dewletên herêmî penageh bigerin û ne jî bikevin destê şerên hegemonîk. Ji ber ku tu hêz li Rojhilata Navîn polîtîkayên li ser bingeha azadiya gelê Kurd hilnaberîne. Her dewlet li gorî ewlehî, bandor û berjewendiyên xwe tevdigere. Îran, Tirkiye, Iraq, Sûriye, DYA û Îsraîl hemî li gorî berjewendiyên xwe yên stratejîk nêzî mijarê dibin.

Tam di vê nuqteyê de ye ku perspektîfa rêya sêyemîn a Rêber Apo girîngiya dîrokî bi dest dixe. Ji ber ku rêya sêyemîn ne li ser hilbijartina di navbera du hêzan de ye. Bê guman ne li ser rêzkirina li pişt aliyekî û girtina helwestên li dijî aliyê din e. Rêya sêyemîn li ser avakirina hêza xwe ya civakî, rêxistina xwe, parastina xwe û siyaseta xwe ya demokratîk e.

Civakên ku di pêvajoyên dîrokî yên weha de rêya xwe wenda dikin bi hêsanî têne şûştin. Siyaseta ku li dû pêşketinên rojane diçe di dawiyê de dest bi xizmetkirina berjewendiyên yên din dike. Ji ber vê yekê, perspektîfa Rêber ne tenê nêzîkatiyek siyasî ya hemdem e; ew di heman demê de kompasek dîrokî ye. Ji ber ku gelên ku pusula xwe winda dikin, dikarin bibin beşek ji hesabên stratejîk ên yên din, her çend ew difikirin ku ew di asta herî xurt a xwe de ne. Li erdnîgariyeke dijwar û nazik wekî Rojhilata Navîn, her gelê ku bêparastin bimîne zû bi gefa tunekirinê re rû bi rû dimîne.

Ji ber vê yekê, xweparastin ne tenê meseleyeke leşkerî ye. Xweparastin... Ew rêyek e ku gel bîr, ziman, çand, îrade û hebûna xwe ya civakî biparêze. Gelên ku sax dimînin ne tenê ew in ku şer dikin, lê di heman demê de ew in ku dikarin xwe birêxistin bikin.

Bi heman awayî, pergaleke siyasî ya Kurd a parçebûyî ji destwerdanên derve re xeternak dibe. Ji ber vê yekê, yekîtiya neteweyî ya demokratîk ne formeke teng a neteweperweriyê ye; ew meseleya pêşxistina têgihîştineke hevpar e li hember gefên hevpar. Ji ber ku ne tenê avahiya siyasî ye ku parçe dibe; pêşeroja gel jî parçe dibe.

Ji ber vê yekê, faktora diyarker a rastîn asta rêxistinê di nav civakê de ye. Bêyî pêşxistina komîn, encumen, rêxistinên jin û ciwanan, û lêkolînên çandî û zimanî, Kurd nikarin pêşeroja xwe ji bo demek dirêj biparêzin. Civateke bêrêxistin bi hêsanî tê manîpulekirin; civateke rêxistinkirî çarenûsa xwe digire destê xwe. Îro, dema ku Rojhilata Navîn ji nû ve tê şekildan, erkê bingehîn ê ku gelê Kurd pê re rû bi rû ye, ne ew e ku wekî aîdî yên kesên din were nivîsandin, lê ew e ku ramana xwe ya stratejîk ava bike. Ew e ku ne bi guherînên hestyarî, lê bi hişmendiya dîrokî ya demdirêj tevbigerin. Ji ber ku di vê erdnîgariyê de, yên ku sax dimînin ne tenê ew in ku şer dikin, lê di heman demê de ew in ku dikarin rastiya xwe ava bikin.

Mesele êdî ne tenê mayînde ye. Mesele avakirina pêşerojê ye bêyî ku rêya xwe winda bikin.

Ji ber vê yekê, rêya Kurdan ne rêyek pêşwext diyarkirî ye. Ew meşek dîrokî ye, ku her roj bi hewildan, rêxistin û îrade ji nû ve tê avakirin. Û navê wê meşê wekî xwe dimîne: Rêya sêyemîn, xwe dispêre hêza xwe, parastina rastiya xwe û neketina bin kontrola tu hêzekê.



# Welatiyên Sûriyê di nava pirsgirêkên ewlehî û civakî yên kûr de jiyan dikin

**Piştî hatina hikumeta demkî li ser desthilatdariya Sûriyê, rewşa ewlehî, jiyanî, civakî û aborî roj bi roj xerabtir bû. Ji bûyerên xwekuştinê bigre heta mirina bi gulbarana bêserûber û sûcên kuştina zarok gihiştiye asteke metirsîdar**

**Navenda Nûçeyan**

Ji destpêka hatina hikumeta demkî li ser desthilatdariya Sûriyê, gelên Sûriyê bi pirsgirêkên ewlehî, civakî, jiyanî û aborî yên giran rûbirû mane. Ji ber şert û mercên jiyanê yên zehmet, kê ewlehî û aramî, bûyerên xwekuştin û kuştina zarokan zêde bûye. Herwiha ji ber belavbûna çekan jî mirov bê sûc bi şaştî tê kuştin.

### Bûyerên xwekuştinê

Li gel xirabûna şert û mercên jiyanê û zêdebûna zextên psîkolojîk û aborî, bûyerên xwekuştinê li herêmên cuda yên Sûriyê bi awayekî metirsîdar berdewam dikin, ev yek jî mezinbûna dijwariyên ku nifûs pê re rû bi rû maye di ber çavan re derbas dike.

Di vê çarçoveyê de, Çavdêrgeha Mafên Mirovan a Sûriyeyê ji destpêka vê salê ve 30 xwekuştin belge kir, di nav wan 23 mêr, 5 jin û 2 zarokan li deverên cuda yên welêt xwe kuştine.

Ev hejmar zêdebûneke metirsîdar a rêjeyên xwekuştinê nîşan didin, ku ji bo kêmkirina vê diyardeya ku her ku diçe zêde dibe, pêdivî bi zêdekirina hewldanên civakî û fermî ji bo dabînkirina piştgiriya psîkolojîk û civakî û çareserkirina sedemên kûr ên têkildarî şert û mercên dijwar ên aborî û jiyanê heye.



### Diyardeya gulebarana bêserûber

Li çend herêman bûyerên guleyên bêserûber zêdebûneke domdar dibînin, ku ji ber hebûna berfireh a çekan û bikaranîna wan a bêserûber a berdewam, bûne gefek rasterast li ser jiyana sivîlan. Ev diyarde di salên dawî de bûye fikarek mezin, piştî ku bi dehan kesan jiyana xwe ji dest da û yên din, di nav de zarok û jin jî, birîndar kirin.

Bûyerên guleyên bêserûber di nav pirsgirêkên ewlehî û civakî yên herî berbiçav de ne, ji ber ku ew pir caran ji ber gulebarana bêserûber di dema bûyer an şeran de, an jî ji ber karanîna xelet a çekan çêdibin, ku sivîlên ku tu têkiliya wan bi bûyer an şert û mercên derdorê re tune ne, dike ku ji nişka ve birîndarî an mirina wan çêbibe.

Li gorî Rewangeha Sûrî ya Mafên Mirovan ji destpêka sala 2026'an ve 70 kes bi guleyên şaş an jî bi xeletî ji ber belavbûna çek û bombeyan di destê welatiyan de hatine kuştin, di nav wan de 40 mêr, 26 zarok û 4 jin hene, herwiha 60 kesên din jî bi birînên cûrbecûr birîndar bûne.

Ev hejmar asta windahiyên mirovî yên ji ber belavbûna berdewam a çekan û nebûna kontrolê li ser karanîna wan nîşan didin, û pêwîstiya bi girtina tedbîrên bibandortir ji bo kêmkirina vê diyardeyê û dûrketina ji qurbaniyên sivîl ên zêdetir destnîşan dikin.

### Nêzî 50 bûyerên cinayetî yên kuştina zarokan hatine tomarkirin

Di nava aloziyên ewlehiyê û pirsgirêkên civakî yên berdewam de li herêmên cûrbecûr ên Sûriyê, bûyerên tundûtûjî û kiryarên sûc ên ku jiyana zarokan dikujin berdewam dikin,û ev yek balê dikişîne ser yek ji pirsgirêkên mirovî yên herî bi êş: mafê zarokan ê jiyan, ewlehî û parastinê ji hemî cûreyên tundûtûjî û hedefgirtinê.

Zarokên ku divê di hawîrdorek ewle de mezin bibin ku mezinbûn, perwerdehî û aramiya wan a derûnî û civakî garantî dike, pir caran xwe qurbaniyên şert û mercên aloz, pevçûn û bandorên ewlehî û civakî dibînin ku siya xwe diavêjin ser hûrguliyên jiyana wan a rojane.

Prensîbên mirovî û peymanên navneteweyî yên li ser mafên zarokan pêwîstiya parastina zarokan ji hemû cureyên tundûtûjî û îstîsmarê destnîşan dikin û mafê wan ê jiyana bi ewlehî di nav malbat û civakên xwe de garantî dikin. Parastina zarokan wekî nîşaneyek sereke ya aramiya civakê û şiyana wê ya avakirina pêşerojek çêtir tê hesibandin. Lêbelê, berdewamiya sûcên ku zarokan hedef digirin an jî wan dikujin, fikarên mezin li ser asta xetereyên ku niha ev koma herî xeternak pê re rû bi rû ye, zêde dike.

Ji dema hilweşîna rejîma berê ve, sê sûc li parêzgehên cuda yên Sûriyeyê hatine tomar kirin, ku tê de sê zarok hatine kuştin. Ev sûc li du sûcên li Şamê hatine kirin ku bûne sedema mirina du zarokan, û sûcek li parêzgeha Tartusê ku bûye sedema mirina zarokekî hatine dabeş kirin.

Di sala 2025an de, Çavdêrgeha Sûrî ya Mafên Mirovan kuştina 33 zarokan di bûyerên cuda yên sûc de belge kir, ku li gelek parêzgehên Sûriyeyê belav bûne, di nav wan de Şam û Gundewarê Şamê, Heleb, Hums, Hema, Lazqiye, Dêra Zorê, Idlib, Dera û Suweydayê, ku ev yek nîşan dide ku ev bûyer berfireh bûne û ew ne tenê bi yek deverê ve sînordar in.

Di sala 2026an de, wekî ku ji hêla Çavdêriyê ve hatî belgekirin, ev bûyer bi kuştina 13 zarokan berdewam kirin ku di bûyerên sûc de hatine tomar kirin, ku li gundewarên Şamê, Heleb, Dêra Zorê, Reqa, Hema, Şam û Suweydayê belav bûne, û hejmara qurbaniyan di navbera parêzgehek û parêzgehek din de cûda dibe.

Ev hejmar tenê îstatîstîk an daneyên hejmarî nîşan nadin, lê belê çîrokên mirovan, jiyanên ku zû bi dawî bûne, xewnên ku nehatine pêkanîn, û malbatên ku zarokên xwe di şert û mercên trajîk de winda kirine temsîl dikin.

Her wiha ew mezinahiya pirsgirêkên ku civak di parastina zarokan de pê re rû bi rû dimîne, û pêwîstiya xurtkirina tedbîrên ewlehî, civak û mafan ên ku ji bo wan hawîrdorek aramtir û ewletir peyda dikin, destnîşan dike.

Zarok ne tenê qurbanên bûyerên rojane ne; ew pêşeroja civakê ne, û her binpêkirina mafê wan ê jiyan û ewlehiyê rasterast bandorê li pêşeroja nifşên pêşerojê dike.

# Amerîka êrişî Îranê kir, operasyon bandorê li diyaloga dualî dike?

**Navenda Nûçeyan**

**Amerîka êrişî başûrê Îran û derdora Tengava Hurmizê kir, artêşa Amerîkî tekez kir ku ev operasyon di warê parastin hêza xwe ya li herêmê de hat pêkanîn. Herwiha jêderên ku ji nêz ve hevdîtinên Amerîka û Îranê dişopînin destnîşan kirin ku ev êriş bandorê li agirbesta heyî û diyalogê nake.**

Fermandariya Navendî ya Amerîkayê, CENTCOM'ê ragihand ku di 25'ê Gulanê de artêşa Amerîkayê ku li başûrê Îranê tiştê ku wê di çarçoveya êrîşên parastinê jêdera avêtina mûşekan û keştiyên Îranî yên mayînan li herêmê bi cih dike, hedef girtin. Berdevkê CENTCOM'ê Tim Hawkins da zanîn ku hêzên Amerîkî li başûrê Îranê ji bo parastina hêzên Amerîkayê ji gefên hêzên Îranî, êrişên parastinê pêkanîne.

Di heman demê de Hawkins da diyarkirin ku ev operasyon di bersiva çalakiyên ku wekî gefek rasterast ji bo hêzên Amerîkî li herêmê têne hesibandin de ne. Hawkins rave kir ku hedef cihên avêtina mûşekan û keştiyên Îranî yên hewl didan mayînan biçînin dihewîne, herwiha wî tekez kir ku Fermandariya Navendî di dema agirbestê de bi awayekî nerm parastina hêzên xwe dike.

Ev daxuyanî dihat dayîn di heman demê de teqînên li deverên cuda yên başûrê Îranê, nêzîkî Tengava Hurmizê re pêkdihatin. Raporan nîşan dan ku li bajarê Bandar Abbas teqînek çêbûye, ji bilî teqînên din ên li nêzîkî bajarên Sirik û Jask yên hemberî rêya avê ya stratejîk in.

Gelek hûrguliyên din ên ku ji hêla dezgehên medyayê yên Amerîkî, di nav de Fox News, hatine ragihandin, serkirdeyekî leşkerî diyar kir ku hêzên Amerîkî du keştiyên Pasdarên Îranê dîtin dema ku ew li Tengava Hormuzê mayînan bi cih dikirin, di encamê de ew rûxandin. Heman çavkaniyê destnîşan kir ku êrişeke din jî cihekî mûşekên erd-esmanî li herêma Bandar Abbas hedef girtiye, Washingtonê jî di vê derbarê de got ku ew gefê li balafirên şer ên Amerîkayê li herêmê dixwe.



Li gorî rayedarên Amerîkî, ev operasyon ji bo parastina hêza xwe bi nav kir û bersiveke rasterast ji bo gefên rasterast ên Îranê bûn, bêyî ku agirbesta heyî were têkbirin. Du çavkaniyên din ên ji nêz ve rewşa diyaloga Îran û Amerîkayê dişopînin piştrast kirin ku êrîşên dawî nayên wateya hilweşîna agirbestê û tekez kirin ku ew dikevin bin çarçoveya parastina leşkerî û nîşan nadin ku agirbest di navbera her du aliyan de bi dawî dibe.

# Tirkiyê tenê ji bo xelaskirina xwe bangî aştiyê kir

Dewleta Tirk di gelek qonaxên dîrokê de, dema ku bi qeyran û tengasiyan re rû bi rû maye, çareserkirina pirsgirêka Kurd ji bo xwe xelaskirinê bikar aniye. Lê bi berdewamkirina siyaseta înkar û asîmîlasyonê, aştiya rastîn pêk nayê. Çareseriya pirsgirêka Kurd bi demokratîkbûna Tirkiyê û qebûlkirina mafên Kurdan ve girêdayî ye.

**Navenda Nûçeyan**

Dîroka dewleta Tirk her tim reş û bêaram e. Dewleta Tirk di xwe xelaskirinê de gelekî zîrek e, her dema ku tengasiyek li ser wê hatiye, xwe avêtiye deriyekî û bi wê rêyê xwe xelas kiriye. Lê aliyê ku herî zêde xwe pê xelas kiriye, Kurd in. Di dîroka dûr û dirêj de gelek serhildanên Kurd li Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê hatine lidarxistin, lê bi xapandin an jî bi xiyaneta dewletê, ew serhildan nîvco mane an jî têk çûne.



### Bakurê Kurdistanê

Bakurê Kurdistanê yek ji çar beşên erdnîgarî yên Kurdistanê ye û beşa herî mezin a Kurdistanê ye. Bakurê Kurdistanê di roja îro de di nava sînorên polîtîk ên Tirkiyê de maye ku piştî Şerê Cîhanê yê Yekem, bi parçekirina Kurdistanê re, ji aliyê Tirkiyê ve hatiye kolonîzekirin. Bi damezrandina Komara Tirk re, ji aliyê dewletê ve li hemberî ziman û çanda Kurdî polîtîkayên astengkirinê, zextê û înkarkirinê hatine destpêkirin, heya roja îro jî berdewam kirine. Bi damezrandina Tirkiyê re, nakokiyên pirsgirêka Kurd û pirsgirêkên li Bakurê Kurdistanê berdewam dikin. Partiyên siyasî yên Bakurê Kurdistanê yên ku hewla çareseriyeke mayînde dikin, hewl didin ku polîtîkayên asîmîlasyonê, astengkirina li hemberî ziman û çanda Kurdan, herwiha binpêkirinên mafên mirovan ku ji aliyê Tirkiyê ve tên pêkanîn, kêm bikin an jî biguherînin. Bakurê Kurdistanê beşa herî zêde ya Kurdistanê ye ku bi awayekî tund di bin zexta asîmîlasyonê de maye û guhertinên demografîk û polîtîkayên valakirinê lê hatine pêkanîn. Li gorî texmînan, li Bakurê Kurdistanê nêzîkî 25 heta 30 milyon Kurd dijîn. Ji xeynî nifûsa heyî ya li Bakurê Kurdistanê, di dîrokên cihêreng de ji ber valakirin û şewitandina gundên Bakurê Kurdistanê ku di navbera salên 1990 û 2009'an de ji aliyê Tirkiyê ve hatine şewitandin û valakirin, bi sed hezaran Kurd ji Bakurê Kurdistanê koçber bûne.

### Serhildanên Kurdan li Bakurê Kurdistanê yên diyarker

Serhildanên Kurdan li Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê, wekî berxwedaneke li dijî polîtîkayên înkar, asîmîlasyon û ji bo bidestxistina mafên neteweyî, ji damezrandina Komara Tirkiyê û pê ve, pêk hatine. Di nav wan de yên herî diyarker ev in:

Serhildana Şêx Seîd (1925): Li Pîranê dest pê kir û bû yek ji mezintirîn tevgerên neteweyî û olî yên Kurdan. Her çend dewleta Tirk serhildan tepeser kiribe jî, lê vê serhildanê bandoreke mezin li ser dîroka herêmê hişt.

Serhildanê Agiriyê (1926-1930): Di bin serkêşiya rêxistina Xoybûnê û Îhsan Nûrî Paşa de li dora Çiyayê Agirî hatin lidarxistin.

Serhildana Dêrsimê (1937-1938): Bi pêşengiya Seyîd Riza li dijî polîtîkayên asîmîlasyonê pêk hat. Ev serhildan di bin navê "Terteleya Dêrsimê" de bi komkujiyeke mezin a li ser xelkê sivîl bi dawî bû. Ji bilî van serhildanan gelek serhildanên din jî pêk hatin, di salên dawiyê de li hemberî qeyûmên Şaredariyan û hwd… din jî gelê Kurd li ber xwe dan.

### Berdewamkirina di siyaseta asmîlekirinê de, rêgirtina dergehê ronahiyê ye

Di nava rapora xwe de herî zêde em ê balê bikşînin li ser Tevgera Aazadiyê ya ku bi pêşengiya Rêber Apo ve hate damezrandin, herwiha pêvajoyên aştiyê yên ku ji bo çareserkirina pirsgirêka Kurd û hemû pirsgirêkên din ên li Bakurê Kurdistanê hatine destpêkirin, bi taybet pêvajoya herî dawî ya "Aştî û Civaka Demokratîk" ku bû deregehek nû ji bo dewleta Tirk, lê dewlet ronahiya vê dergehê li ber çavan nagire û di berdewamkirin siyaseta xwe ya asmîlekirinê û hwd… de bi israre.

### Pêvajoyên destpêkê yên ji bo çareseriyê

Pêvajoyên aştiyê yên li Bakurê Kurdistanê bi giranî di navbera dewleta Tirkiyê û Tevgera Azadiya Kurd de pêk hatin. Dîroka van hewldanan ji agirbestên salên 90'î dest pê dike û digihîje heta pêngavên berfireh ên çareseriya demokratîk.

Li vir kronolojî û qonaxên sereke yên van pêvajoyan hene:

### Pêngavên destpêkê û agirbestên yekem (1993 - 1999)

Agirbesta 1993'an: Bi pêşengiya Serokkomarê wê demê Turgut Ozal û banga Rêber Apo ve, cara yekem agirbestek hat ragihandin. Lê bi mirina Ozal re pêvajo têk çû.

Agirbestên 1995 û 1998'an: Tevgera Kurd çend caran agirbestên yekalî îlan kir, lê dewletê bersivek erênî neda.

Dîlgirtina Rêber Apo 1999'an: Piştî ku Rêber Apo di 1999'an de anîn girava Îmraliyê, PKK'ê biryara vekişîna gerîlayan da û şerekî demkî yê bêçalakî dest pê kir.

### Danûstandinên 2005 û 2006'an

Di vê serdemê de bi rêya navbênkaran hin hevdîtinên nepenî hatin kirin. Di sala 2006'an de dîsa banga agirbestê hate kirin, lê ji ber zextên siyasî yên li Tirkiyê ev hewldan jî bêencam man.

### Pêvajoya Osloyê û aşkerekirina hevdîtinan 2009 û 2011'an

Li paytexta Norwêcê (Oslo) bi fermî şandeyên dewleta Tirk û PKK'ê li ser maseyê rûniştin. Ev hevdîtin wekî qonaxeke dîrokî dihat dîtin, lê piştî hin qeyranên siyasî û şerê li qadan di 2011'an de bi dawî bû.

### Pêvajoya çareseriya demokratîk 2013 û 2015'an

Daxuyaniya Newroza 2013'an: Li Amedê di pîrozbahiyên Newrozê de peyama Rêber Apo ya agirbest û vekişînê hate xwendin. Di vê pêvajoyê de "Şanedeya Îmraliyê" ya ku ji siyasetmedarên Kurd pêk dihat û rayedarên dewletê, bi hev re hevdîtin kirin.

Protokola Dolmabahçeyê 2015'an: Di navbera hikumeta AKP'ê û HDP'ê de li Qesra Dolmabahçeyê ya Stenbolê nexşerêya çareseriyê hate eşkerekirin. Lê belê, dewleta Tirk ev pêvajo di nîvê 2015'an de betal kir.

### Pêvajoya Aştiyê zêdeyî salekê hatiye destpê kirin

Di 27'ê Sibata 2025'an de di bin serenavê "Aştî û Civaka Demokratîk" de pêvajoyeke nû ya aştiyê li Bakurê Kurdistanê hate destpêkirin. Ev pêvajo ji aliyê Rêber Apo ve û li ser bangkirina Devlet Bexçelî, pêk hat. Ji vê banga dîrokî re, gelek peyamên piştgiriyê hatin û bi awayekî bi lez li ser asta cîhanê ev pêvajo bû rojev. Di heman demê de di çarçoveya vê bangê de, Tevgera Azadiyê bi biryardayîneke mezin têkoşîna çekdarî ya zêdeyî 50'î salî veguheran aliyê diyalogê û ser maseyê. Pêre jî gavên dîtir avêtin û her gavek ji gava din binirxtir û hêjatir bû. Lê mixabin beramberî van gavan dewletê tevger nekir û wekî xwe ma. Dewleta Tirk weke her car dixwaze her tişt li gorî wê were kirin, tenê gotinan bêje beyî ku gavan biavêje. Lê bi vî rengî ne ji aliyê civaka Kurd û ne jî ji aliyê Tevgerê ve tê qebûlkirin. Herî kêm di nava salekê de divyabû guhertineke biçûk jî ba, pêk anî ba, lê; Tecrîd li ser Rêber Apo ranebû, mafê hêviyê yê Rêber Apo û hemû girtiyên siyasî nehate bidestxistin, guhertin di zagonên Tirkiyê de nehate kirin û Komara Tirkiyê wekî xwe maye. Ev hemû jî neyta dewletê dide diyarkirin ku ne neyta aştiyê ye.

### Piştî salekê ji pêvajoyê çi rû dide?

Dewleta Tirk ne ku heyranê aştiyê ye û dixwaze pirsigirêkên li Bakurê Kurdistanê, bi taybet bi Kurdan re çareser bike. Lê dema wê dît sira şer nêzî wê dibe, herwiha qeyranên di hundirê wê de kurtir dibin, xwe da ber dîwarê aştiyê, da ku tava vê aştiyê wê binixûmîne û xelas bike. Weke tê zanîn sed sal e nexşereyeke nû ji bo Rojhilata Navîna nû hatiye dayîn û ji wê demê heya niha ve, şer, pevçûn, alozî û qeyran di nava Rojhilata Navîn de tên jiyîn. Bi taybet piştî şerê Îsraîl û Hemasê qonaxeke nû li herêmê hate destpêkirin, piştre şer û êrişên dîdtir hatin derxistin. Herwiha guhertina sîstemên sed salê pêk tên ku di nav de jî rejîma Sûriyê hilweşiya û li şûna wê hikumeteke nû hat. Herî dawî jî niha ku şerê Îsraîl-Amerîka li hemberî Îranê hate destpêkirin, da ku sîstema Îranê jî were guhertin. Di vir de dema ku şer gihaşt Îranê dewleta Tirk bi tirs bû û guman kir ku piştî Îranê dor li ser wê ye. Lê dema ku wê dît ev rejîm zû bi zû neyê hilweşandin an jî wê hevsengî werin kirin, di Pêvajoya Aştiyê de xetmandinê dide jiyankirin. Li vir ne ku Tevger Azadiyê yan jî Rêber Apo bê alternatîv in, lê di daxuyanî û nirxandinên nûnerên Tevgerê, herwiya yê Rêber Apo de jî her tişt bi zelalî derdikeve, Rêber Apo û tevger bi hemû awayan naxwazin rêya şer dîsa derkeve û neçarî çê bibe. Lewma divê dewlet li hemberî vê yekê xwe dûr nexe, pêvajo ne tenê çareserkirina pirsgirêka Kurd li Tikriyê ye, lê dema Komar were guhertin wê çareseriya hemû pirsgirêkên Tirkiyê be. Ya herî girîng mafê hêviyê pêk were.



**Farûk Sakik**

### Siyaseta Xweparastinê?!

Piştî ku derbarê CHPê de biryara "bêhukmiya teqez" hat dayin, civak vê biryarê meraq kir. Em behsa piştî biryara "bêhukmiya teqez" nekin. Di hiqûqê de tê çi vateyî bidin aliyek. Ji bo ku ev biryar biryarek hiqûqî nine. Ev biryarek siyasiye. Hedef û armancê vê biryarê yên ji navendek hatî plankirin, henin. Her hemleyên Erdogan yên li dijî mixalefetê stratejiyek xwe heye. Ne bi tenê li dijî CHP'ê li hember Kurdan jî bi heman stratejiyê tevdigere.

Armanca vê hamleyê ya herî sereke rojevê biguhere. Dixwazin kes behsa rewşa siyasî ya Tirkiyê neke. Kes behsa; belengazî, bêedaletî, astengiyên li pêşiya jiyana rojane neke. Dixwazin civakê ji vê rojevê dûr bixin û bi vê hemleyê bide mijûlkirin.

Dixwazin mixalefet, tucarî rojevê destnîşan neke û însîyatîfê negire dest xwe. Armancek xwe ya din jî mixalefetê her tim di moda xwe parastinê de bihile. CHP îroj di vê rewşêdeye. Ji Ekrem Îmamoglu destpêkirin. Herkesî dizanibû ku ev biryarek siyasiye, lê ew ketin moda parastinê. Her roj derketin qadan sond xwarin, gotin 'bi qûran' me van sûca pêknaniye.

Civak ji xwe dizanibû ku ev biryar siyasiye û bi van biryaran bawerî nedanîn. Lê mixabin ev baweriya civakê CHP nedît û heroj sond dixwarin ku em bêgunehin.

Gel bawernekir lê Kiliçdaroglu bawerîanî. Di daxwiyaniyên xwe de behsa bêehlaqiyê dike. Kiliçdaroglu bi vê sekna xwe ji kîjan siyasetê re xizmet dike wê di rojên pêş de zelal bibe.

CHP serkeftina xwe ya 31'ê Adara 2024'an jibîr kirin. Nezanibûn ku ev êriş, êrişên li dijî vê serkeftinênin. Îktidar derdora xwe çiqas biçûk bixe ewqas mezin dibe. AKP jî vê yekê dike. Ev êrişên li dijî CHPê, di salên berê de li ser siyaseta demokratîk an Kurdan jî hebû. Dizanibûn ku civak bawernake ku siyasetmedarên Kurdan sûcê kirmînal pêk bînin. Radibûn bi 'terorê' tewanbar dikirin. HDP-DEM partî bi van yekan îtibar nedikir û têkoşîna xwe didomandin.

Piştî serdama nû pêngava aştî û civaka demokratîk destpêkir. Heman tiştî dixwaze bide pêş tevgera azadiyê. Dixwaze Kurd jî bikevin pozîsyona xwe parastinê.

Diviya hin gav bavêtina qanûn bihatina guhertin-derxistin, lê wan hebûna PKK'ê dewam dike wek hincet nîşan dan û pêvajo dan seknandin-paşvaxistin. Tevgera azadiyê neket vê defikê, neket moda xwe parastinê. Stratejiyên xwe yê têkoşînê dixin meriyetê. Rojev jî îroj ji aliyê Rêber Apo û tevgera azadiyê ve têne destnîşankirin.

Me nedît ku rojek bikevin moda xwe parastinê û bibêjin, me hemû çekên xwe îmha kirin û dawî li şer anî. Ji bo çi vê yekê nabêjin? Dizanin û herkes dizane ku li gor rihê-kodên serdema nû tevgeriyane.

Daxwazên dewletên yên ku pêvajo ji aliyê îstixbarat û eskerî ve were teyitkirin, leyîzke.

Kurd bi vê yekê mijûl nabin û yek tişt digirin rojev xwe. Dibêjin, ji bo ku Serok Apo bikaribe vê pêvajoyê birêve bibe jî divê statuya wî bê diyarkirin. Pêwîst e ev statu bibe hiqûqî, bibe qanûnî û bibe biryar. Têkoşîna xwe ji li gor vê yekê dizayin dikin.

Ango aliyên Kurdan rojeva xwe, bixwe destnîşandikin û li gor wê jî tevdigerin. Rêber Apo di hevdîtina dawî de jî dibêje; "Em hewl didin, girêka di meseleya Kurd de bi salan e korbûyî, vekin. Em dikarin ji vê pêvajoyê re bêjin, ji nû ve sererastkirin, hemdemkirin û modernkirina têkiliya Kurd û Tirkan."

Kurd hewldanên dewletê yên 'siyaseta xweparastinê', datînin aliyek, li gor peyamên Rêber Apo tevdigerin.



# Zindawerên çand û hunera Kurdî



**Can Yûsiv**

Helbestvan Diya Ciwan " Îkona têkoşîna jinan û parêzvana nasnameya kurdî"

Edebiyat, bi taybetî jî helbest, yek ji girîngtirîn navgînên ku gelên ku li ber piştguhkirin û têkçûnê de bi kar tînin, da ku nasnameya xwe ya çandî û zimanî biparêzin.

Di çarçoveya kurdî de, ku zimanê kurdî bi gelek dijwariyên dîrokî re rû bi rû maye, navên edebî derketine holê ku peyv kirine amûra berxwedanê û nivîs veguherandine qada parastina bîra civakî.

Helbestvana kurd diya Ciwan yek ji van dengên afirîner tê hesibandin ku bi zimanê xwe yê zelal û vegotina xwe ya kûr,

bedewî û rengdariyek taybetî li helbesta kurdî zêde kiriye.

Tevî şert û mercên çavdêriyê û qedekirine û hem jî kêşeyên ewlehiyê yên dijwar ku gelê Kurd li deverên curbicur ên Kurdistanê jiyabû, karîbû bi awayekî bi bandor beşdarî parastina zimanê Kurdî û bihêzkirina hebûna nasnameya netewî bibe.

Tecrubeya wê nimûneyek îlhamdar bû ji bo jina kurdî ya ronakbîr , ya ku di navbera hişmendiya neteweyî û rola çandî de hevrêzîyekî çêdike, û dikare bend û sînorên dijwar bişkîne bêyî ku têkiliya xwe ya kûr bi reh û nasnameya xwe re winda bike.

Di erdnîgariyek ku bi dîrok û birînên xwe giran bûye de, helbestvana kurdî Diya Ciwan hat dinyayê, ne wek kesekî asayî, lê wek dengê ku bîra gelekî bi tevahî hilgirt. Li wir, li Botanê, ku çîrok bi dengê çiyayan re tevdigerin, taybetiyên wê yên pêşîn hatin avakirin, û tovên ziman di hundurê wê de wekî nasname û hebûnê geş bûn, ne tenê wek amûrek ragihandinê.

Zeyneb Mela Ehmed Şozî, bi nasnav (Diya Ciwan), di sala 1953'an de li herêma Sêrtê li bakurê Kurdistanê ji dayîk bûye û di malbateke kurdperwer, welatparêz û Rewşenbîr de mezin bûye ku ji biçûkatiya wê ve hezkirina ziman û hestên xweparêzî di dilê wê de çandine.

Ew li ber destê bavê xwe û hin melayan xwendiye, di nav malbata xwe de hînî xwendin û nivîsandina bi kurdî bûye û di jîngeheke dewlemend a mîrata gelêrî de mezin bûye, ku ev yek jî bûye sedema avakirina hişmendiya wê ya destpêkê.

Di sala 1966'an de diçe Rojavayê Kurdistanê û li bajarê Qamişlo bi cih dibe û li wir bi hunermend û siyasetmedar Seîd Şozî re dizewice û 6 zarokên wan çêdibin.

Paşê, di sala 1975an de, ew ligel malbata xwe ji bo peydakirina debara jiyana xwe çûye Şamê, li wir fêrî pîşeya dirûtinê bûye da ku alîkariya malbata xwe û hevjînê xwe bike di hilgirtina barê jiyanê de, di heman demê de, wê xwest ku perwerdehiya herî baş ji zarokên xwe re peyda bike, û mala wê bû dîdargeha çandî û siyasî ji bo ronakbîrên kurd.

Tevî bar û berpirsiyariyan jî, di sala 1977'an de di dema ku tîpên kurdî dihatin qedekirin û ziman dihat astengkirin, wê dest bi rêwîtiya xwe ya edebî kir, wê helbest, çîrok û şano bi kurdî nivîsiye û berhemên xwe di rojname û kovaran de weşandine û hebûna xwe wek dengekî edebî yê pabend terxan kiriye ji bo pirsgirêkên gelê xwe. Her wiha di xebata neteweyî de jî cihê xwe girt heta ku bû yekemîn jin dinav Komîteya Navendî ya Partiya Demokrat a Kurdistan - Sûriyê de.

Tevî zext û zordariya li ser wê hat kirin jî ,wê rêya xwe bi baweriyekî xurt bi peyama xwe re domand ,digel giranbûna şert û mercên ewlehiyê û şerê li Sûriyê, di sala 2013'an de koçî Dihokê kir û li wir jî çalakiya xwe ya çandî domand heta dawiya jiyana xwe, û mîrateyek hişt ku têkiliya di navbera gotin û nasnameyê de nîşan dide.

Helbestvana kurd Diya Ciwan, helbesta klasîk a kurdî bi kêşe û rêzbend , li gel çîrokê, nivîsandiye, bi zimanekî zelal ku tê de bedewî û rastî diherike.

Berhemên wê bo zimanê Erebî hatine wergerandin û gelek helbest û gotarên ku behsa pirsgirêkên jinan, nasnameya Kurdî û têkoşîna li hemberî zilmê dikin, li ser rûpelên kovar û rojnameyên Kurdî û Erebî hatine weşandin.

Helbestên wê bi girêdayîbûna kûr bi xemên gelê kurd ve têne nasîn, ku di wan de mijarên azadî û welat wek bingehê sereke derdikevin pêş.

Helbestên wê bûne neynika êş û hêviyên gel, û dengek ku hesreta wan a bi rûmet û azadiyê berdewam radigihîne.

Wê mîrateyekî wêjeyî ya dewlemend hiştiye, ku di nav de bi dehan berhemên çapkirî hene, hemû bi zimanê kurdî ne, ji berhemên wê yên herî girîng:

1- Pêlek ji Deryayê Kovanên Min — Dîwaneke helbestan (Şam, 1992).
2- Hêsrên Ziwa – Dîwaneke helbestan (Şam, 1998).
3- Bazbend– Komek çîrok (Şam, 1997).
4- Abratên Serhildêr — ji berhemên helbestî yên girîng.
5- Baran— Dîwaneke helbestan.
6- Çîrokên Kurdan – Beşa Yekem — (2004).
7- Çîrokên Kurdan – Beşa Duyem — (2007).
8- Bênder — Dîwaneke helbestan (2007).
9- Gotinên Pêşiyan — (Duhok, 2007).
10- Firmeskên Azadiyê — Dîwaneke helbestan.

Bi vî awayî, nivîsên wê ne tenê metnên "nivîsarên" wêjeyî bûn, lê belgeyên zindî bûn ku bi wijdanê gel de têne tevgerandin, û têkiliya kûr di navbera gotin û nasnameyê, û di navbera afirandin û têkoşînê de nîşan didin.

Helbestvana Kurd Diya Ciwan çendîn post û erkên çandî û yasayî "hiqûqî" girtibûn, ew endam bû di Komîteya piştgirîkirina dozên jinên Sûriyê de, û her wiha endam bû di Komîteya Festîvala Helbestê ya Kurdî li Sûriyê , her wiha beşdarî komîta xelata nivîskar Osman Sebrî bû ,û di sala 2004'an de ev xelat pêşkêşî hevala gelê Kurd xanim Daniyal Mîteran kir. Di heman salê de, ew ji aliyê Parlamentoya Swêdê ve wek nivîskareke kurd hate pêşwazîkirin û bi wê re gelek hevpeyivînên medyayî hatin kirin li çend platformên navneteweyî, bi taybetî jî li Radyoya Stockholmê ya Navneteweyî û Radyoya Berlînê ya Navneteweyî, ji bilî kovarên erebî, kurdî û ewropî, ev hemû nîşan didin ku hebûna wê ya çandî ji sînorên welat derbas bûye û bandorek berfireh li qada edebî ya navneteweyî çêkiriye.

Helbestvana kurd Diya Ciwan ne bi tesadufî nivîsandina bi kurdî hilbijartiye, lê wê wek helwesteke hişmendî û berpirsiyariya çandî girtiye ser xwe, ew têgihişt ku zimanên bêguhdan ber bi winda bûnê ve diçin, û ku vejandina wan tenê bi riya yên ku bi wan dinivîsin û jê re jiyanek nû di nav nivîsan de didin pêkanîn .

Wê ji bo zarokê ku ji zimanê xwe bêpar maye nivîsî, û ji bo dayikê ku stranên kevn ji tirsê winda bûnê ezber dike, û ji bo welatê ku di her helbestekê de ji nû ve tê avakirin. Zimanê wê di heman demê de bi hêsanî û kûrahîyê tê nasîn, ji ber ku ew nêzîkî lêdana dilê gel bû û bi ruhê mîrata gelêrî ve girêdayî bû, wê ne ji bo xwepesindanê dinivîsand, lê ji bo mayîna ziman dev û dilan de zindî bimîne û mayîna nasnameyê wek bîranînek zindî di bîra civakê de bimîne.

Helbestvana Kurd Diya Ciwan, rêzdarî ji bo beşdarbûna wê ya wêjeyî û rola wê ya çandî û neteweyî, çendîn xelat û bawenameyên pesindayînê wergirtine, ji nav wan:

1- Xelatkirina Partiya Çep a Kurdî li Sûriyê di sala 1995an de.
2- Spasname ji Heftemîn Festîvala Helbesta Kurdî li Sûriyê sala 1997an.
3- Xelata helbestvan "Melayê Cezîrî" li Herêma Kurdistanê.
4- Xelat ji Festîvala Navdewletî ya Jinên Aferîner, û bawernameya pesindayînê ji Wezareta Rewşenbîrî ya Tûnisê di sala 2001 de.
5- Xelata sedsaliya Barzaniyê nemir sala 2003ê.
6- Rûmetkirina ji Zanîngeha Dihokê di sala 2005'an de.
7- Xelata Festîvala Rojnamevanî ya Bêdrxaniyan di sala 2006'an de.
8- Medalyaya zêrîn ji Wezareta Çandê ya Herêma Kurdistanê di sala 2007 de.
9- Xelata Wezareta Çandê li Herêma Kurdistanê di sala 2008 de.
10- Spasname ji Wezareta Çandê di festîvala helbestan a "Akrê " ya sala 2008 de.
11- Bawernameya rêzgirtin û pesindayînê ji saziya "Mediya" ya Rojnamegeriyê di sala 2011an de.
12- Xelata Festîvala Helbesta Niştimanî ya Kurdî li Herêma Kurdistanê di sala 2012 de.



Her wiha şevên wêjeyî û çandî jî ji bo wê li çend welatan hatin lidarxistin, ji wan: Tûnis, Lubnan, Sûriye, Herêma Kurdistanê , Fransa, Holanda, Swêd û Almanya, ku hebûna wê ya berfireh û bandora wê di qada çandî ya kurdî û navneteweyî de nîşan dide.

Helbestvana Kurd Diya Ciwan ne tenê dengek helbestvanî bû, lê hebûnek jinê ya çalak di qada çandî ya kurdî de nîşan da , wê parastina rola jinê di civak û çandê de dikir ,û nimûneyek pêşkêş kir ji jinê ronakbîr û têkoşer ku hevbendiyê di navbera hişmendî û afirandinê de çêdike. Her wiha di gelek rêxistinên têkildarî pirsgirêkên jinan de beşdar bûye,rolek lîstik ku hebûn û rola jinê di jiyana giştî de bihêz û berfireh bibe.

Wê jiyana xwe ji bo parastina peyva kurdî ji jibîrbûnê terxan kir, û wêje kir pirek paşerojê bi dema îroyîn re girêdide, û hestê kesayetî bi nasnameya kolektîf re dike yek, , lewra serpêhatiya wê bû şahidek zindî li ser hêza gotinê di parastina bîra civakî û avakirina hişmendiyê de.

Helbestvan û çîroknûsa Kurd, Diya Ciwan, roja Çarşemî 26ê Sibata 2025'an, piştî nexweşiyeke giran ku pê ketibû, di temenê xwe yê heftê û du salî de, li nexweşxaneya "Vîn" a bajarê Dihokê li Herêma Kurdistanê koça dawî kir û bi merasîmeke girseyî ya bi heybet û laşê wê li goristana Delbî" li bajarê Dihokê hat veşartin.

Rehmetî , yek ji dengên jin ên pêşeng di wêjeya Kurdî de dihate hesibandin, ji ber ku ne tenê di qada afirandina wêjeyî de xebitî, lê wê xemên gelê xwe hilgirt û li hember dijwariyên siyasî û zextên ewlehiyê bi cesaret û wêrekî rû bi rû ma, nemaze di serdema desthilatdariya Partiya Bei's de.

Wê kar û xebatên edebî yên girîng pêşkêş kir, ku di gelek berhemên bi zimanê kurdî de xwe nîşan dan,bi riya wan berheman, wê şopêk zelal di rêwîtiya helbest û edebiyata kurdî de hişt, û gotin kir amûrek ji bo parastina nasname û rûmetê.

Helbestvana kurd Diya Ciwan mîrateyek edebî ya dewlemend li pey xwe hişt ku pirtûkxaneya edebî ya kurdî dewlemend kir û di rêwîtiya helbest û çandê de tevkariyek bi nirx pêşkêş kir.

Bi çûyîna wê re neteweya kurd yek ji stûnên helbesta jinan winda kir, û dengekî ku parêzvanê nasname û zimanê kurdî û berevanê hebûna wan di bîr û wijdanê de winda kir. Ji giyanê diya helbestvana Kurd Diya Ciwan re rûmet û mandarî û ji mîrateya wê ya têkoşerî, neteweyî û edebî re mayînde û domdarî.

# Aboriya Jin projeyên xwe yên xwetêrkirinê didomîne

Rêvebera Aboriya Jin li Tirbespiyê Evîn Hacî Hesen tekez kir ku demsala çandiniya îsal encamên pir baş bi xwe re aniye, herwiha ji bo xurtkirina hilberîna herêmî û pêkanîna xwetêrkirinê ew projeyên xwe yên çandiniyê didomînin.



**Lîloz Hisên/Tirbespiyê**

Bi kedeke mezin ji sala 2015'an aboriya jin hate avakirin. Cara yekem bû ku koperatîf bi rengê jinê hatin avakirin, aboriya jin ji çandiniya genim destpê kir û piştre bi berhemên wê projeyên bazirganî, pîşesazî û hwd.. hatin avakirin. Hewldaneke mezin hat kirin da ku di warê aborî de sîstemeke taybet ya girêdayî jinê bê avakirin. Kongra Star ev xebat da meşandin da ku aboriya jinê ava bike, ku di encamê de gelek proje û hejmareke mezin ji jinan tevlî projeyan bûn ji bo ku xwe bi xwe bibe sermiyanê mal û jiyana xwe. Li bajarê Tirbespiyê jî gelek proje hatin avakirin û karîbûn encamên mezin bo vê salê li ser asta çandiniyê bi dest bixin.

Derbarê vê mijarê de Rêvebera Aboriya Jin li Tirbespiyê Evîn Hacî Hesen ji rojnameya me re li ser berdewamiya pêkanîna projeyên wan yên çandiniyê, axivî.

### 'Ji bo zêdekirin helberîna herêmî Aboriya Jin roleke girîng lîst'

Ji dema avakirina komîteya jinê sala 2015 û vir ve, ji bo piştgiriya jinan û dabînkirina derfetên kar bo jinên herêmê, ew projeyên xwe li Tirbespiyê yên çandiniyê berdewam dike, ev yek jî bi armanca xurtkirina helberîna herêmî û pêkanîna xwetêkirinê.

Rêvebera Aboriya Jin li Tirbespiyê Evîn Hacî Hesen diyar kir ku aboriya jinê ji bo gelek jinan çavkaniyeke dahat û derfeteke kar e û wiha anî ziman: "Projeya Demsal ye ji projeyên girêdayî Aboriya Jin li Tirbespiyê ye, bi awayekî serke xwe dispêre çandiniyê. Ji bilî erdên çandiniyê li devera "Elî Bedran" ku lê berhemên Kizbera û Genim vê salê hatiye çandin. Di nava vê projeyê de derdora 20 jin kar dikin, ji destpêka çandiniyê heya çinînê kar dikin. Rûbera erdê girêdayî Koperatîfa "Elî Bedran" nêzîkî 750 donim e, ji xwe ev deverên çandiniyê di zêdekirina hilberîna herêmî û peydakirina derfetên kar ji bo jin û malbatên hejar de roleke girîng lîstine."

Evîn Hacî Hesen wiha zêde kir: "Aboriya Jinê li Tirbespiyê çar nangeh ji bo nanê Sêlê vekiribû, lê ji ber pêşektin û bûyerên dawî sê ji wan hatin girtin û yek tenê heya niha tê xebitandin. Tevî van zehemtiyan jî, bi armanca berfirehkirina helberînê û peydakirina derfetên kar ji bo jinên ku di nava projeyê de kar dikin, di rojên pêş de dê nangeheke nû dîsa bê vekirin."

### Projeya Dugirê

Evîn Hacî Hesen behsa projeyê Aboriya Jin li gundê "Dugirê" kir û wiha berdewam kir: "Ev proje encamên pir baş di demsala heyî de pêk anî. Di çarçoveya pilanên me ku armanc wê cihêrengiya zeviyên çandiniyê û hilberîna herêmî zêde bike, 150 çewalên genim û 10 çewalên ceh hatin çandin. Li aliyê din ê projeyên 150 çewalên din yên genim hatin çandin di heman demê de 5 çewlên pembo. Ev projeyê di warên çandinî û bikaranîna enerjiya alternatîf de berfirehbûnek berbiçav dît. Ji bo dabînkirina pêdiviyên elektrîkê yên projeyê, enerjiya rojê hate sazkirin, ji bilî kolandina bîrek avê, bi armanca piştgirîkirina proseyên avdanî û çandiniyê li erdên projeyê."

Evîn Hecî Hesen wiha li axaftina xwe zêde kir: "Proje bi çandina genim ve sînordar nema, lê belê bi awayekî berfireh çandina darên fêkî û xemilandinê jî di nav xwe de digirt. 144 darên Berû, 200 darên Serû û 200 darên fistiqan, di heman demê de darên hêjîr û tirî hatin çandin. Di rojên pêş de, em ê hewil bidin ku sebzeyên havînê biçînin da ku pêdiviyên bazarên herêmî bicîh bînin. Ev proje ji bo nêzîkî 15 malbatan derfetên kar dabîn dike, da ku bibe alîkar ji bo başkirina şert û mercên jiyanî yên gelek malbatan, tê de jin û mêr bi hev re xebata çandiniyê, avdan û lênerîna dar û zeveiyan dikin."

### Pilanên pêşerojê

Derbarê plana çandiniyê ya pêşerojê, Evîn Hacî Hesen diyar kir ku plana wan piştî ku çinîna genim û ceh biqede, garis dê bê çandin, wekî gavekê ku armanc dike di tevahiya salê de li erdên çandiniyê veberhênanê bê kirin û hilberîna çandiniyê li herêmê zêde bike.

Rêvebera Aboriya Jin li Tirbespiyê Evîn Hacî Hesen wiha gotina xwe qedand: "Demsala çandiniya îsal yek ji baştirîn demsalên ku herêmê di van salên dawî de dîtiye ye. Kalîteya hilberîna çandiniyê ya di projeyê de di nav projeyên me yên din ên li Dêrik û Til Temirê de di rêza yekem de bû, ku ev yek asta hewildanên ku di rêvebirina projeyên çandiniyê û balkişandina ser berhem û rêbazên avdanê yên nûjen de hatine kirin, nîşan dide."

# Tevî zehmetî û pirsgirêkên çandiniyê cotkar projeyên xwe berdewam dikin

**Jîn Hisên/Amûdê**

**Tevî pirsgirêkên avhewayê û lêçûnên çandiniyê yên zêde, herwiha ziyanên ku di nava sektora çandiniyê de çêdibin, bi armanca zêdekirina cihêrengiya hilberînê û domandina çandiniyê, cotkar Helîm Reşik projeya xwe ya çandiniyê berdewam dike.**

Di çarçoveya guherînên avhewayê û lêçûnên çandiniyê yên zêde de, cotkar bi zehmetiyên ku berdewamiya projeyên wan ên çandiniyê tehdît dikin re rû bi rû dimînin, nemaze piştî barana zêde ya vê salê ku zirarên berfireh da berhemên zivistanê. Di nav van projeyan de, projeyeke çandiniyê ku xwe dispêre enerjiya rojê û li ser 300 doniman hatiye kirin, derdikeve pêş, di nav de çandina berhemên cûrbecûr, dar û sebzeyan heye.

Cotkarekê ji gundê Topo yê gundewarê Amûdê Helîm Reşik e ku tevî hemû astengiyan projya xwe ya çandiniyê dewam dike, ji Rojnameya me re axivî.

### Çandin Genim

Genim di nav berhemên herî ku têne çandin û îstratîjîk e li herêma Cizîrê. Cotkar Helîm Reşik 280 donim genim çandibû, hem xwesipartibû avdan û hem jî barîna baranê ji bo zeviyê xwe, lê ji ber barana zêde û bi taybet barîna teyrokan zirar gihîştiyê piraniya zeviyê wî, tenê 40 donim baş maye, li gorî ku cotkar ji me re gotiye.

Helîm Reşik wiha ji me re axivî: "Min îsal genim, ceh, fûl û kemûn çandinbû. Lêçûna çandina genim ji ber buhayên tov, gubre, cotkirin û avdanê pir buha bûn, ji ber barana zêde, zêdebûna çilbûnê û derketina nexweşiyan di nava zeviyan de windahiyên mezin çêbûn, eger min hin tedbîr û dermankirin nekiriba, dê berhem bi temamî hatiba hilwişandin."

### Çandina berhema pîvazan

Helîm Reşik destnîşan kir ku lêçûna çadina pîvana pir buha bû û wiha anî ziman: "Min 60 donim pîvaz çandiye, kirîna tovan tenê 5 hezar dolar bû, semada germ û cemidî buhaya wê bi hezar û 700 dolarî bû."

Helîm Reşik diyar kir ku ji ber bahoza teyrokan û barana zêde gelek nexweşî di nava zeviyê wî de derket û wiha berdewam kir: "Dema ku bahoza teyrokan hat zirar gihîşt pîvazan û nexweşiya fungî û kêzikan lê derket. Min tedbîrên xwe girt, lewma berhem du caran hat derman kirin herwiha tonek û nîv semda cemidî me lê reşand, piştre karkerên ku di nava zevî de kar dikin, paqijkirin. Niha em gelekî avdanê nakin ji ber ku şilbûna zêde nexweşiyan derdixe, ji ber vê yekê niha me avdan sekinandiye heya avhewa gerim bibe da em ji nû ve av bikin."

### Sebzeyên havînê

Ji bilî berhemên zeviyan, cotkar sebzeyên havînê jî diçîne, nêzîkî 25 donim sebzeyên cûrbecûr çandine, her yek 2 donim in. Miloxiyê 2 donim, bamî 5 donim, Şebeş 4



donim, Enenas 5 donim herwiha fasûlî û lûbî, bacanê reş û sor û hwd..

Cotkar Helîm Reşik wiha zêde kir: "Niha karkerên ku di zeveiyan de kar dikin ber berheman tevir dikin ji bo ku derkevin, piştre em ê semad bikin û av bikin."

### Bikaranîn enerjiya rojê

Ji bo misogerkirina domdariya projeya çandiniyê, cotkar ji bo dabînkirina ava pêwîst ji bo avdanê, xwe dispêre pergala enerjiya rojê. Wî 16 panelên rojê û du bîrên avê kolandiye, yek bi kapasîteya 40 û ya din bi kapasîteya 75.

Ji xwe di çarçoveya buhabûna sotemeniyê û nebûna elktrîkê, pergala enerjiya rojê bûye pêwistiyeke li her deverê, ji ber ku heta astekê dikare beşekê ji lêçûnên çandiniyê kêm bike.

### Çandina daran

Projeya ku cotkar Helîm Reşik vekiriye tenê bi berhemên demsalî sînordar nem, belê ew hewil dide ku darên fêkîiyan jî biçîne, di çarçoveya pêşxistina projeya çadniniyê û zêdekirina cihêrengiya helberînê, wiha cotkar axaftina xwe qedand: "Min dest bi çandina donimek darên Tirî kiriye, ez ê di rojên pêş de dara Mişmiş û Zeytûnan jî biçînim. Di heman demê de min pilan kiriye ji bo hawirdekirina 180 darên curbicur yên fêkiyan di nav de darên guîz û fisteqan ji Kobanê û Efrînê."

Tevî zirara berfireh ji ber baran zêde û bahozên ku çêbûn, hîn jî cotkar di zeviyên xwe de kar dike û pilanên xwe ji bo pêşxistina projeya xwe berdewma dike, her çend jî domandina helberîna çandiniyê ji ber şert û mercên dijwar ên avhewa û aborî yên ku sektora çandiniyê pê re rû bi rû ye, bûye zehmetiyeke rastîn.



# Şêrzad Yezîdî: Divê yekrêziya Kurdî di çarçoveya dirûşmeyan de nemîne

Nivîskar û siyasetmedar Şêrzad Yezîdî tekez kir ku yekrêziya gelê Kurd di vê qonaxa guhêrbar a ku Sûriyê, herêm û cîhan tê re derbas dibe, gelek girîng e, lê divê yekrêzî tenê di çarçoveya dirûşmeyan de nemîne.

**Ronahî Sadûn**

Derbarê girîngiya pêkanîna yekrêziya Kurdî li ser asta Kurdistanê, nivîskar û siyasetmedar Şêrzad Yezîdî bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Di demekê de ku Rojhilata Navîn di qonaxeke hestiyar re derbas dibe û nexşe tên guhertin; li Rojava entegrasyon, li Bakur pêvajoya aştiyê, li Rojhilat êrişên Amerîka û lawazbûna rêjîmê, Li Başûrê Kurdistanê jî hewldanên xeniqandina aborî û siyasî tê meşandin. Di demeke wiha de, girîngiya yekrêziya gelê Kurd çawa digre dest?**

Du Kurdên welatparêz û kurdperwer di mijara yekrêziya gelê Kurd de, ne xwedî nerînên cuda ne. Mijara herî sereke û astengiya herî mezin ku rê li ber gihîştina mafê rewa yê gelê Kurd li her çar parçeyên Kurdistanê digire, nebûna yekrêziya Kurdî ye. Yekrêziya Kurdî ser asta Kurdistanê, vê yekê dixwaze ku di navbera hemû parçeyên Kurdistanê de hemahengî û têkilî hebe, di bin kîjan navî de be, heger jê re bêje sîwanek an jî Kongreyeke netewî, ev ne pirsgirêke. Di nav her beşekî de jî, ev pêwîstî heye. Niha em zêdetir behsa Rojavayê Kurdistanê dikin. Bêguman yekrêziya gelê Kurd di vê qonaxê de, ev qonaxa guhêrbar a ku Sûriyê, herêm û cîhan tê re derbas dibe, gelek girîng e. Lê divê yekrêzî tenê di çarçoveya dirûşmeyan de nemîne. Bi deh û sedê salan e xwena miletê me, Tevgera Rizgariya Kurdistanê, tevgera siyasî li Rojava û li seranserê Kurdistanê "Yekbûna gelê Kurd e." Hewldanên berdewam ji bo vê armancê hebûn, lê gelek caran digihîştin astekê û dîsa vedigeriyan xala destpêkê. Eger em li ser Konferansa Rojavayê Kurdistanê ya 26'ê Nîsanê ya sala borî biaxivin, em dikarin bibêjin ku gavek pir pêşketî û balkêş bû, bi taybet belgeya ku jê derket ji bo nasandina doza Kurd li Sûriyê û parastina mafên gelê Kurd di çarçoveya Sûriyê de, girîng bû. Lê mixabin piştî zêdeyî salekê em dibînin ku tu kes nema behsa wê dike. Li vir pirsa sereke ev e: kî berpirsiyar e? Em dikarin bêjin ku plan û êrişên dijmin jî rola xwe tê de hebû, lê



berpirsiyariya vê rewşê jî dikeve ser milê me wek Kurdan. Em nikarin her tim bêjin ku hemû tişt rast e û kêmasiyên me tune ne, ev nêrîn ne rast e. Nimûne, bi gelek mehan me didît ku danûstandin li Şamê di çarçoveya serenavê "Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) û hikumeta demkî ya Sûriyê" de dihatin kirin, lê tu girîgî bi ew şandeya Kurdî nehat kirin. Ev ne tenê berpirsyariya aliyekî ye, heq wa bû ku aliyê Rêveberiya Xweser, aliyê danûstandin li gel Şamê dikirin û rejîma HTŞ'ê bi xwe jî, ev li ber çavan girtiba ya. Her çend danûstandinan zêdetir li ser lihevkirin û rêkeftinên leşkerî û rêxistinî di çarçoveya Rêveberiya Xweser de bûn, lê em nikarin bibêjin ku ev dosya ji hev cuda ne. Ji ber ku mijara Kurd sedema sereke ye ji bo dirûskirina vê rêveberiyê û ji bo pêkanîna Hêzên Sûriya Demorkratîk e. Dibe ku wek serenav tiştekî Kurdî bi fermî tê de tune be, lê her kes dizane ev hêz kî ye, çi ye û ji bo çi ye û di çarçoveya maf û doza Kurd de wek kevirê herê bingehîn di avakirina Sûriya demokratîk de ye. Ji ber vê yekê, rexnedayîn divê bi rastî û bi berpirsiyariyê be. Em nikarin tenê bêjin ku hemû şaştî ji aliyê din e. Piştî bûyerên mezin, planên dijmin, êrişên li ser Şêxmeqsûd û planên mezin ên derveyî, helwesta hin aliyên navneteweyî, taybet helwesta Amerîka û şexê Tom Barak jî ne rast û ne exlaqî bû. Lê em nikarin bibêjin ku ev hemû wisa çêbû, berpirsyarî li ser milê me jî heye. Pêwîstbû wek Rêveberiya Xweser û QSD'ê pêşwext xwendin û plan heba ne ku heger sînaryoyên wilo çê bibin, li hemberî wa, çawa bikin. Lê tiştê çêbû, çêbû. Niha mijara yekrêziya Kurdî hîn jî berpirsiyariya me ye.

**Astengiyên li pêşberî yekrêziya Kurdî bi taybet partiyên Kurdî di milê navneteweyî, herêmî û navxweyî de çi ne?**

Mixabin niha aliyên Kurdî her aliyek ji xwe re tenê diçe Şamê. Heta vê dewiyê jî me şandeyeke PYD'ê li Şamê dît. Ji aliyê xwe ENKS'ê jî dibêje: "Xwedû yên li Şamê silavekê li me bikin." Di vê çarçoveyê de, ev konferans û yekrêziya Kurdî dîsa vala derdikeve. Ji ber vê yekê rewş pir xerab e. Yekrêzî tenê bi dirûşm û hestiyariyê dimîne, lê li ser bingehê pratîkî tu yekrêzî tune ye. Heya di konferansa Nîsanê de tiştê herî baş ew bû ku behsa çareseriya doza Kurd û mafê federalî hate kirin. Em nabêjin divê bi zorê federalî be, mijar ne ew e ku em bêjin federalî an na, lê nenavendîbûn, yanî federalî, etonomî an rêveberiyên xweser heger çi bin, girîng in. Lê niha, bi rastî ev tişt tune ye. Herwiha ew rêkeftina 29'ê Çileyê ya di navbera QSD'ê û hikumeta demkî ya Sûriyê de çêbû, niha piştî çend mehan ku em niha behsa 5 mehan ji pratîkê dikin, derdikeve ku ew ne gelekî di cihê xwe de ye. Gelek kirdarên rejîma Şamê hene ku nîşaneya şovînîzm û dîktatoriyê ne, ew mijara Kurdî vala derdixin û wê wekî ku ji xwe re dixwazin şîrove dikin. Wek nimûne, "Meclisa Gel" niha heman Meclisa Gel a Beşar El-Esed e, ew meclisekî tezwîrî ye, ne hilbijartin e û ne pêşbirk hene. Di bingeh de, tevî ku rejîma Esed ket jî, jiyana siyasî ya rastîn, herwiha firehî û pirrengiya siyasî tune ye. Mafê karê siyasî li ser asta hemû Sûriyê tune ye ku em bikaribin behsa hilbijartinên rastîn bikin.

**Di qonaxeke wiha tevlihev de, eger yekrêziya Kurdî pêk neyê wê çi encaman bi xwe re bîne?**

Tiştê ku niha li Sûriyê çêbûye ev e ku desthilatdarek di çarçoveya peymanên navdewletî û herêmî de hat dayîn ku ew jî HTŞ'ê ye. Niha tiştê ku çêdibe ne qonaxek an pêvajoyeke veguhêz e, ev tenê guhertina sîstemê ye, sîstema Baas ket, sîstema HTŞ'ê hat. Ev rastiyek e. Lê niha kesek ku siyasetê dike, bi taybetî aliyê Kurdî, nikare wisa tevbigere ku her tiştê ku li ser wî were ferzkirin bê qebûlkirin û bêje temam ma em ê çi bikin, ev ne siyaset e. Mirov dikare vê yekê wek cureyek ji teslîmbûnê binirxîne. Siyaset ew e ku tu zanibî çawa danûstandinê bi rastiya heyî re bikî û çawa ji tiştên berdest sûd werbigirî. Carinan jî pêdivî ye ku mirov fersendên nû biafirîne, rêyên nû veke û hewl bide ku çember û planên ku li dijî wî hatine avakirin, vala derxe û bişkîne. Lê yekrêziya Kurdî mixabin niha li Rojava di rewşeke nebaş de ye. Tevî ku berxwedana li Şêxmeqsûd û navçeyên din hemû derket holê, helwesteke Kurdistanî ya herî beriz derket ku di dîroka tevgerên siyasî û azadîxwaz de ev asta yekgirtin û piştgirîya civaka Kurdistanî li her çar parçeyên Kurdistanê, nebûye û çênabe. Lê mixabin me nikarîbû li ser vê yekê ava bikin, taybetî li Rojavayê Kurdistanê. Ew hemû piştgirî ku ji bo Kurdan çêbû, Kurdistan dikaribû li ser lingan seknî ba ye. Heger em behsa Başûrê Kurdistanê bikin, ji Silêmaniyê heya beşên din piştgiriyeke herî xurt pêk hat, dikaribû ev rewş bi awayekî baştir bihata bikaranîn û ji bo xurtkirina cihê xwe yê diyalogê li gel hikumeta Şamê sûd jê wergirtiba. Lihevkirinên ku heta niha hatine çêkirin, bi taybetî Peymana 10'ê Adarê, gelek xalên lewaz hene. Bi rastî jî ev lihevkirin di cihê xwe de ne têrker in, ji dosiya mafê Kurdan, bêtir xizmeta hikumeta demkî kirine. Ev lihevkirina dawî jî di heman çarçoveyê de ye. Mijara Meclîsa Gel jî wisa ye ku dibêje tenê 4 endamên Kurd hebin. Ger Kurd serê sedî 10'ê xelkê Sûriyê bin jî, ev ne dadperwer e. Herî kêm Kurd ji sedî 15 heta 20 xelkê Sûriyê ne, ji ber vê yekê, ger em tenê sedî 10 jî hesab bikin, divê di vê meclîsê de kêmanî 25 endamên Kurd hebin.

**Gotina te ya dawî çi ye?**

Tiştê niha çêdibe, divê em hewl nedin ku di bin navê tektîk, siyaset û êrişan vala derxînin, tişta ku rastî çêdibe, tesfiyekirina doza Kurd li Sûriyê ye. Wekî ku ew ji xwe re dibînin û dibêjin, Kurd li Parêzgeha Hesekê ji sedî 20 dernakevin û di hejmarê kursiyan de jî bi vî awayî cih girtine. Ev çar kes wekî nûnerên Kurdan, di nav 210 kesên hikumeta demkî de ku piraniya wan kevne baasî, HTŞ û DAIŞî ne, çi dikarin bikin? Tiştekî wiha li hev nayê. Her çiqas em bêjin ev qonaxek xebatê ye, lê bi vî rengî nabe. Mijara Kurdan bi paş de vedigere û destkeftiyên Rêveberiyê bi vê nêzîkatiyê vala derdikevin. Ji ber ku li Sûriyê sîstemek navendî tê avakirin, taybetmendiyên Kurdan û navçeyên Kurdî heta niha nayên parastin. Her kes bi vê nêzîkatiyê texmîn dike ku lihevkirin bi vî rengî naçe serî.



# Rêber Apo: Piçûkdîtina demokrasiyê şaştiyeke mezin e


Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk a li Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê yek ji projeyên herî girîng ên nûjen a herêmê ye, di vê çarçoveyê de Rêber Apo di 25'ê Gulanê de peyamek şand û tê de got, "Civak li hemû qadên jiyanê ji etîkê bigire heta siyaset, hiqûq û aboriyê xitimandinekê dijî. Dema me ya windakirinê tune."

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

### Pêvajoya aştiyê girîngtirîn projeya nûjen a herêmî ye

Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk a li Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê yek ji projeyên herî girîng ên nûjen a herêmê ye. Peyamên Rêber Apo li ser vê pêvajoyê ne tenê bangek ji bo rawestandina tundûtujiyê ne, lê her projeyek ji bo veguherandina civakî, siyasî û hiqûqî ne. Doza Kurdî tenê bi rêbazên leşkerî an ewlehiyê nayê çareserkirin, lê pêdivî bi demokratîkbûn, qanûn û avakirina civakeke xwerêxistinkirî heye. Di şert û mercên îroyîn de, Rojhilata Navîn di nav alozî û pevçûnan de ye. Şerên herêmî, dijberiya dewletan û mezinbûna netewperestiya tund bûne xetereyek ji bo aştiya gelan. Li Tirkiyê jî doza Kurdî bi salan e bûye sedema pevçûnên çekdarî, ziyanên civakî û astengkirina demokratîkbûnê. Ji ber vê yekê bangên Rêber Apo yên di çarçoveya pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk de dixwazin şertên siyasî yên nû bên afrandin, ji bo ku gelê Kurd û Tirk bikaribin li ser bingeha hevjiyanî û mafên wekhev bijîn.

Lewma jî Rêber Apo di peyama xwe ya dawîn a 25'ê Gulanê de wiha dibêje: "Civakên ku xwedî hêrsekî mezin in bêyî fikir û nirxên etîk nayên veguherandin. Civak li hemû qadên jiyanê ji etîkê bigire heta siyaset, hiqûq û aboriyê xitimandinekê dijî. Lewma em di pêvajoyê de israr dikin û ecele dikin. Ez wisa difikirim ku konjektura Rojhilata Navîn ji her tiştî re vekirî ye. Dewletên weke Îsraîl û Îranê tûj dibin û wisa xuya dike ku dê hê tûjtir jî bibin. Li Rojhilata Navîn xurtkirina netewperestiyê, ji hev cihekirin û mezinkirina netewperestiya teng zerarê dide. Em pêvajoyeke ku çavdêriya geşedanên bi rîsk dike, pêşî li vê bigire û hesabên xwîndariyê ji holê rake bi rê ve dibin. Helbet ya girîng ew ê ku hemû tiştên tên kirin bi qanûnan dikare bê mîsogerkirin. Li bendemayîn û tevgerîna bi bendewariyê tenê xetereyan derdixîne. Dema me ya ku em winda bikin tune ye. Ez bawerim hemû aktor dê bi vê berpirsyariya dîrokî tevbigerin û Meclîs jî dê xebatên xwe bi vê hesasiyetê bi rê ve bibe. Çarçoveya qanûnî dikare bingeha pêvajoyê ava bike. Sererastkirina qanûnan dê bibe pêvajoyeke avakirina înşayeke pozîtîf a rasteqîn û demokrasiyê. Demokratîkbûyîn pêdiviyeke bingehîn e û serkeftina pêvajoyê me nêzî vê armancê dike."



### Têkliya demokrasî û komarê bi hev re

Ji avabûna komara Tirkiyê heyanî avabûna dewletê bi partî û saziyên cuda ve pirsgirêk ne tenê li ser partiyekê ye yan kesayetekî ye, mijara sereke ew e ku çanda demokratîk di pergala siyasî û jiyana civakî de kêm e. Tevî ku di dîroka Tirkiyê de gelek caran hewildanên aştiyê hatine kirin, lê bêencam mane, di vî warî de Rêber Apo gelekî xebitiye. Di serdema heyî de piştî van gavên bi nirx ên ku ji hêla Tevgera Apoyî ve hatine avêtin, eger demokrasî tenê di warê teşeyî û axaftinan de bimîne û di pratîkê de rê li ber azadiya siyasî û pêkanîna aştiyê were girtin, êdî komar ji bingehên xwe dûr dikeve. Piştî destpêkirina pêvajoyê Rêber Apo têgiha komara demokratîk bi giranî derxistiye pêş, gelo çima? Têkiliya di navbera komar û demokrasiyê de girîng e. Komar tenê bi navê xwe têr nake; divê bi naverokeke demokratîk were dagirtin. Mafên siyasî, azadiya îfadeyê, rêxistin û muxalefet divê bên parastin. Heke ev nirx nebin, komar dikare tenê bibe formek bê naverok.

Rêber Apo di hevdîtina dawîn de balê dikişîne ser vê mijarê û dibêje: "Gelo ketina bi zorê ya navenda giştî ya partiyeke siyasî, bi şikandina deriyê wê ya bi balyozê, li gorî rêbazên demokrasiyê ne? Pêkanînên li ser Partiya Gel a Komarê (CHP) û geşedanên ku diqewimin, bi nebûna demokrasiyeke rast û siyaseteke demokratîk re têkildar in. Sedema ku rewş anî vê astê bêparbûna ji prensîba demokrasiyê ya di bingeha komarê de ye. Encamên nêzîkbûna li demokrasiyê mîna ku luksek, demagojiyek an jî gotegotek be û piçûkdîtina demokrasiyê şaşiyeke giran û girîng e. Ti rewşeke ku bi qasî pêşxistina pênaseya demokratîk a komarê lezgîn be, nîn e. Em di vî welatî de hewl didin ku zemîna vê pêş bixin û îmkanên wê mezin bikin. Dema ku em li Îmraliyê ber bi çareseriyê ve ber bi gavên qanûnî ve diçin, amadekirina komarê ji bo derketineke demokratîk û hiqûqeke demokratîk pir girîng dibînin. Em vê weke gaveke ji bo jiholêrakirina kêmasiya demokrasiyê ya di nav partiyê de û di navbera partiyan de jî dibînin. Divê beramberiya hemû hewldanan; gihandina komarê ya bi naverok û çandeke demokratîk û avakirina pergaleke saxlem a hiqûqî erkeke sereke be. Li ser vê bingehê ez bang li her kesî dikim ku piştgiriyê bidin pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk. Ev e wateya entegrasyona Kurdan a di komara demokratîk de. Em hewl didin rewşeke ku bi salan e ji ber meseleya Kurdî asê maye, derbas bikin. Hêmana şîdetê ya ku ji meseleya Kurdî çavkaniya xwe digire, bi sîstematîka çareseriyê tê derbaskirin. Em dikarin ji vê pêvajoyê re pêvajoya ji nû ve birêkûpêkkirin, nûjenkirin û modernîzekirina têkiliyên Tirk û Kurdan jî bibêjin."

### Rêber Apo moral dide pêvajoyê û rêya xetimînê vedike

Rêber Apo di dawiya peyama xwe de wiha dibêje: "Peyamên ronakbîr û akademîsyenên navneteweyî yên ku piştgirî dane pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk, kirin pirtûk. Di vê çarçoveyê de ez dixwazim destnîşan bikim ku ez amade me her cure pêşniyar, rexne û tevkariyan bi awayê herî hûrgilî binirxînim. Di vê serdemê de ku herî zêde pêdiviya me bi aştî û demokrasiyê heye, ji bo piştgiriya wan a pir girîng, ez silav li wan hemûyan dikim."

Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk ne tenê di nav sînorên Tirkiyê an Bakurê Kurdistanê de tê şopandin, lê li ser asta navneteweyî jî bala ronakbîr, akademîsyen û kesayetiyên bîrwer kişandiye. Pêvajoya aştiyê wekî projeyeke siyasî û civakî ya girîng tê tekezkirin. Rêber Apo di dawiya nameya xwe de tekez dike ku ew amade ye ji bo her cure pêşniyar, rexne û tevkariyan binirxîne. Di gelek pêvajoyên siyasî de, rexne carinan wekî dijminahiyê tê dîtin, lê li vir Rêber Apo dide diyarkirin ku rexne û pêşniyar dikarin bibin bingeha pêşxistinê. Ev nîşan dide ku pêvajoya aştiyê tenê li ser daxuyaniyên yekalî nayê birêvebirin, lê bi nîqaş, fikir û beşdariya civakî dikare xurt bibe. Di serdemeke wiha de ku pêvajo di nava xetimînê de silavkirina Rêber Apo ji bo wan kesên ku piştgirî dane pêvajoyê jî peyameke siyasî digire nava xwe û moralê dide her kesî. Ev yek tê wê wateyê ku piştgiriya civaka zanistî û ronakbîr dikare rê li ber aştiyê veke û baweriya civakê xurt bike. Di heman demê de ev peyman bangeke ji bo me zinbûna hevkariya navneteweyî li ser bingeha mafên mirovan, demokrasiya û çareseriya pevçûnan.

### Dewleta Tirk dereng maye di warê gavavêtinan de

Zêdeyî sal û 4 mehan e ku Rêber Apo banga xwe ya dîrokî kiriye, li ser bingeha vê bangê û peyamnê Rêber Abdullah Ocalan gavên bi lez avêtin, ji ber ku têgihiştineke mezin û kûr hebû derbarê xeteriya ku wê herêma Rojhilata Navîn tûşî wê were. Tevgera Apoyî gavên erênî ji bo pêvajoyê dan avêtin, şerê çekdarî rawestand, kongreya xwe ya fesixkirinê li dar xist, çek bi awayê sembolîk şewitandin, xwe ji Bakurê Kurdistanê vekişand û gelek daxuyanî ji bo rêveçûna pêvajoyê dan. Lê dewleta Tirk çi kir? Dewleta Tirk di bin siya gavên şermok bêbandor de ma, gavên mezin û cewherî yên ku wê demokrasiyê bi xwe re bîne qada Tirkiye û Bakurê Kurdistanê neavêtin. Piştî ku Rojhilata Navîn şemitî nav qada şer, bi taybet Îran ku weke dewleta Tirk dewleteke dagirker e ji axa Kurdistanê re, Tirkiyê hinekî ket tevgerê, lê sûd jî ji vê tevlîheviyê ji hêla dewleta Tirk ve hat kirin. Li aliyekî sûd ji şerê Rojhilata Navîn wergirt û li aliyê din tirsiya ku şerekî nû li hemberî wê were rûdan. Piştî pêla şerê Israîl-DYA û Îran sist bû êdî dewleta Tirk jî xwe sist û bêdeng kir, pê re jî pêvajo li gorî berjewendiyên xwe bir û anî, wekî ku dewleteke ne li aştiyê û ne jî li çareseriyê bigere. Dewleta Tirk di dema heyî de bi demê dilîze, astengiyan ji bo çareserkirina pêvajoyê derdixe, di heman demê de wekû li benda Tevgerê ye ku gavên din bavêje. Rêber Apo di nameya 25'ê Gulanê de bal kişand ser derengxistina ku ji hêla dewleta Tirk ve tê kirin û got, "Mayîna di rewşa bendewariyê de tenê xetereyê diafirîne. Dema me ya windakirinê tune."



# Fîlma Rêya Dûr; Rastiya hevgirtin û destekdayînê

Fîlma Rêya Dûr bi insiyatîfa komek ciwanên jêhatî sînaryoya wê pêk hat. Yek ji lîstikvanê sereke di fîlm de Rodî Osman derbarê fîlm de wiha got: "Naveroka fîlm pêkanîna xewna bavê ku dixwest fîlmekî bikşîne û nedikarî. Herwiha di kişandina fîlm de rastiya naveroka sînaryoyê derket pêş."



**Esma Mistefa**

Fîlma Rêya Dûr a ku di sala 2025'an de hatibû amadekirin û li Festîvala Fîman a Navneteweyî ya Rojava hatibû pêşkêşkirin, bi pêşengtiî û isiyatîfa komek ciwanên xwedî behreya sînema û lîstikvaniyê, hate amadekirin û li ser dikên sînameyê pêşkêş bû. Ev fîlm weke fîlmîn din ku di Rojavayê Kurdistanê de hatine amadekirin, bi gelek zehmetî û astengiyan re rû bi rû ma, heyanî ku derket pêşberî gel. Di derbarê naverok û awayên kişandin û derxistina vê berhemê , yek ji lîstikvanên sereke di fîlma Rêya Dûr de Rodî Osman ji Rojnameya me re axivî.

Rodîn axaftina xwe bi kesên ku ev berhem amadekirine dest pê kir û wiha got: "Tecrûbeyên min yên şanoyê hene û di van demên dawiyê de tecrûbeyên min di nava sînemayê de jî çêbûn. Di demekê de komek hevalên me xwestin sînaryoyekê deynin yên mîna Dilyar Osê, Nasir Inis, Reşîd Mihemed û mamoste Laleş Ebdulrehman bûn. Van hevalan sînaryoyek bi navê Riya dur a ji derhênertiya Reşîd Mihemed, danîn û bi hemû hêza xwe li ser wê nivîsê rawestiyan.

Ev fîlm li Bajarê Qamişlo û gundên derdora wê, hat kişandin. Heyanî Hesekê û hin dîmenên derdora Dêrikê hebûn, nêzî 24 kesan tê de amadebûn."

### Naveroka fîlmê; Pêkanîna xewna bavê ku dixwest fîlmekî bikşîne

Rodî di berdewamiya axaftina xwe de naveroka fîlmê da xuyakirin û wiha pê de çû: "Naveroka sînaryoya fîlma Riya Dur li ser kesekî ku dixwaze xewna bavê xwe pêk bîne. Xewma bavê wî jî ku fîlmekî sînemayê bikşîne. Helbet rastiya me li herêmê ya kişandina fîlman û zehmetiyên wê hene û perçeyek ji jiyana me ye ku em jê ne dur in. Sînaryo li ser kesekî ku dixwaze fîlmekî çêbike ku bi wê yekê xewna bavê xwe pêk bîne ye. Du xetên vê flmê hene, yek trajedîk e û y adin jî komîdî ye. Ez bi xwe di ya komîdî de bi navê Şiyar rol digrim. Hevalê me Dilyar Osê jî xeta trajedîk de rol digirt ku navê wî Yilmaz e û dixwaze fîlmekê bikşîne.

Yilmaz di çêkirina fîlmê de gelek zehmetiyan dibîne, diçe produksyon, diçe beşa muzîkê û digere û dfitile, lê bê encam dimîne. Lê belê di vir de rola Şiyar a komîdî derdikeve pêş. ji berk u xelkê bêhtir nas dike pê re dibe alîkar, Yilmaz û Şiyar diçin cem kesên dewlemend û axa da ku destekê bidin Yilmaz ji bo amadekirina fîlmê. Kesayeta Şiyar a komîdî, kesekî derewan dike, fêlbaziyê dike lê belê ne bi mabestek pîs û xeternak. Her tim dixwaze alîkariya hevalê xwe bike ku her tim xwe mezin dike. Herî dawî rastî produksyon û kesayetên xirab tên û ewqas înasanan dişkînin û xewnan dikujin. Di nava fîlê de gelek nameyên civakî têne dayîn.

Di herî dawî de çawa ku bavê Yilmaz negihîş xewna xwe, Yilmaz jî naghêne xeyala pêkanîna xewna bavê xwe. Lê belê di dawiyê de hevaltiya rast dimîne."

### 'Navedroka Sînaryo di rastiya kişandina fîlmê de derket'

Rodî da zanîn ku sînaryoya vê fîlmê salekê nivîsandî mabû ku weke îfadeya fîlê de derketiye pêş bû û wiha got: "Sînaryoya Fîlma Riya Dur salekê beriya kişadnina wê hatibû nivîsandin û ji ber nebûna derfeta kişandinê ew weke xwe ma. Weke çîroka fîlê bi xwe bû. Hevalê me doktur Aras ku dokturtî dixwend û derçû. Ji me re soz da bû ku pere ango qezenca yekemîn ji vê xwendinê bigre, wê bide me da ku ev fîlm bê kişandin. Di rojeke ne di bîra me de doktur Aras telefon me kir û got ku wî pere dabîn kirine da ku em dest bi kişandina fîlmê bikin. Li ser wê bingehê em tevgeriyan. Perereyên ku di destê me de dîsa jî têra kişandin û derhênertiya fîlm nedikir lê li gor bikaranîna derfetan, dihat çêkirin.

Me di meha 5- 6'an ji 2025'an dest bi proveyên xwe kirin û me bidawî kir. Gelek hevalên din ji bo amadekirina vê fîlmê bi me re bûn alîkar, heval Ragib Diyab weke kemîrevanê sereke bû, û ji hin saziyên teknîk hatin pêşkêşkriin, her wiha Komîna sînema bi me re bû alîkar em spasiya her kesî dikin."

Rodî di nava axaftina xwe de destnîşan kir ku ew ji ber aliyê madî di gelek zehmetiyan re derbas bûn. Pereyên ku di destê wan de tenê têra kişandina fîlmê ya 20 rojan dikir. Rodî da zanîn ku wan di 18 rojan de fîlm kişand û derbasî montajê bû ku di wir de jî gelek kêmasî û zehmetê derketin.

### 'Rihê hevgirtin û destekdayînê derket pêş'

Rodî axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Her çendî kêmasî û zehmetî di kişandina vê fîlmê de li pêşberî me derketin jî, lê civaka me ya Rojava û rihê di nava dost û hevalên me de, hêşt ku em van zehmetiyan derbas bikin û bi her awayî bi hev re bûn alîkar ku hemû qonaxên kişandin û derhênertiya fîlmê bidawî bû.

Fîlm di Festîvala Fîlman a Rojava de hate pêşkêşkirin, piştî wê li hemû herêmên me hat pêşkêşkirin û wê berdewam bike. Projeyên me ji bo demên pêş hîn hene û em bi hêvî ne ku ev rihê hevgirtin û destekdayîna di vê fîlmê de derketiye, di hemû xebatên me de berdewam bike."

# Kewê, qehwexaneya herî kevin li bajarê Amûdê

**Solîn Mihemed/ Qamişlo**

**Qehwexaneya Kewê li bajarê Amûdê ku beriya 70 salî hatiye avakirin, bûye perçeyek ji dîrok û civakbûyîna bajêr. Tê de çîrok tên vegotin û niqaşên cûr bi cûr tên kirin.**

Qehwexane di nava civakê de navendeke girîng e ku xelik serdana wê dikin. Ew cihê danûstandina çandî, sohbet û hevgirtina civakî ye. Li van cihan, welatî li dora çayê an qehweyê dicivin, nûçeyan parve dikin, pirsgirêkan nîqaş dikin û çîrokên xwe vedibêjin.

### Qehwexaneya Kewê

Ev qehwexane avahiyeke ku bi heriyê di sala 1954'an de ji aliyê Mihemedê Kewê ve hate avakirin. Ji wê demê ve bûye cihekî bêhnvedanê ji bo xelkên herêmê û geştiyaran.



Ew kevintirîn qehwexaneye ku li bajarê Amûdê vebû û êdî her kesî jib o bêhinvedanê serdana wê dikir. Ew qehwexane ji ber avahiyeke kevne, ji herî, text, deriyên hesinî û pencereyên textî hatiye avakirin. Heya weke niha jî hîna ew qehwexane wek xwe ye û guhertin tê de çênebûne. Ji ber mala Kewê dixwazin ev qehwexane wekî cihekî xweş yê dîrokî di bajar de bimîn e. Bi tayîbet kesên bi temen mezin berê xwe didine qehwexaneya Kewê da ku dema xwe ya berê vegerînin. Kesên ku serdana qehwexaneyê jî dikin dema xwe bi kaxes û çîrokên xwe yên dema berê derbas dikin. Ji ber qehwa wan ya xweş û balkêş her kesê ji derve jî, daxwaza wê qehwê dikin. Ev qehwexane cihekî girîng e ji bo parastina çand û bîranînên herêmê.

### Karê qehwexanê

Ebdullqadir Kewê ku bi navê "Heno Kewê" jî tê naskirin. Ji dema biçûk bû bi bavê xwe re karê qehwexaneyê dikir, lê dema ku bavî wî wefat bû, êdî Ebdullqadir karê qehwexaneyê avête ser milê xwe. Ebdullqadir heya niha ku temenê wî bûy e 65 sal jî lê wî hîna terika qehwexaneya xwe nekiriye.

Ji ber qehwexane li ba Ebdullqadir cihekî pir girîng e, ji dema ku ev qehwexane hatiye avakirin Ebdullqadir jê hez dike heya ku bi temen xwe mezin bû jî ew hezkirin di dilî wî de çandî ma. Ji ber ev qehwexane bûye wek dîrokek ji bajarê Amûdê re ku her kes serdana wê dike. Ji bo vê yekê jî Ebdullqadir wiha anî ziman: "Em nikarin terika qehwexaneyê bikin ji ber bûye weke hizkirinek pir kûr ji bo me, heya ku ez nema karibim di qehwexaneyê de kar bikim, piştire ez ê bixim e destê zarokên xwe de da ku vî karî berdewam bikin. Da ku ev qexhwexane tu carî neyê girtin û her tim weke turasekî di bajarê Amûdê de zindî bimîn e."

Karê vê qehwexanê tucarî lawaz nebûye, di dema niha de jî ciwan û kalemêr serdana wê dikin.

Ev qehwexane ji seat 8 ê sibehê tê vekirin û heya seat 1 ê nîvro tê girtin û piştire careke din ji seat 4 ê piştî nîvro tê vekirin û heya seat 1 û 2 yê êvarî vekirî dimîn e. Ev yek jî dihêle ku ciwanên bajarê Amûdê her tim serdana wê bikin û şeva xwe li wir derbas bikin.

**Bîra Civakê**



Ehmed Hesen

## Propogandaya reşkirinê dikare civakê ji kokê de biqedîne

Weke têgîn gotina propoganda di navbera salên 1618-1648an de di şerên ku Ewropayê wê demê jiyan dikir de derdikeve holê. Ji tirsa belavbûna ramanên Martin Luther, ji bo armancên propagandayê dêr hatin avakirin. Piştî Şoreşa Fransî, çapemeniyê otorîteyeke girîng bi dest xist da ku bandorê li ser raya giştî bike û ev yek bû sedema bikaranîna propagandayê wekî amûrek siyasî di pevçûnên siyasî de. Taybet propogandayê di pêvajoya lidarxistina hilbijartina serokan, ragihandina şeran, dagirkirina bajaran û nepixandina hêzên hegemonîk de roleke sereke û têrker lîstiye û heta roja îroyîn jî didome. Propoganda bi armanca têkbirina moral û vîna artêşekê, gelekî û civakekê di sedsala 21an de karîbû bi erkeke herî bi bandor rabe û bibe sedema têkçûna gelek hêzan û hatina gelek hêzên dîtir û serxistina wan, ji şerê Emerîka yê li ser Iraq, Afganistan, Qayîde û heta roja îro şerê wê yê li dijî Îranê her tim polîtîkaya propogandayê di nava şerê rasteqîn de pêk hatiye û bandoreke mezin li ser dijberan çêkiriye. Ev hemû jî bi armanca têkçûna derûnî û psîkolojiya hêza ku êrîş li ser wê tê kirin, pêk tê. Di heman demê de bi riya tîmên taybet ên ku van propogandayan bi rêve dibin, hêzên dijber her tim hewla hilweşandina navxweyî dikin, taybet operasyona Bîcerê ya ku Îsraîlê li dijî artêşa Huzbellahê pêk aniye, her wiha kuştina bi dehan serbazên Îranê di nava çend saetan de kûrahiya operasyonên şerê taktîkî yê serdema 21an nîşan dide, ango êdî ji bo ku yekî bikuje, hewcedariya te bi lêpirsîn û dûketinê nîne, hema bi riya hinek pilanên teknîkî dikarin mirovan di malên wan de tesfiye bikin.

Li ser bingeha vê ramanê di pênasekirina şerê elektronîkî de, têgeha şerê elektronîkî komek çalakiyên ku bi armanca keşifkirina elektronîkî ya sîstem û amûrên elektronîkî yên dijmin, têkbirina xebata van sîstem û amûrên elektronîkî, berxwedana li hember keşifkirina elektronîkî ya dijmin û bidestxistina aramiyê di xebata sîstemên elektronîkî yên dostane de di bin şert û mercên karanîna keşif û astengkirina elektronîkî ya dijmin de têne kirin.

Pêşketina van rêbazên şer têrê dikin ku hemû aliyên civakan kontrol û desteser bikin û kengî bixwazin jî têk bibin, ev jî yek ji rêbazên herî nîjentirîn ên şerên sedsala 21an ne.

Niha hêzên dewletdar bi qasî ku şerê propogandaya reşkirinê dikin, ewqas jî şerê rasterast nameşînin û dev jê berdane jî. Fîlmên cîhana sanal a ku salane pêşbîniya pêşketineke nû di teknolojîya şeran de dikin vê rastiyê piştrast dikin. Li vir dijmin pir dibin û zelaliya naskirina wan winda dibe, hema bêje kawosa şerê nedîtî dest pê dike.